


✓ CHP ne ji dil e, di rastiya xwe de bernameyê wê ya ji bo çareseriyê kêşeya kurdî nîn e. Her wiha ev sefera CHP'ê wê li şîkêke tê binavkirin.

✓ Li gorî kesên ku pirsên me bersivandin, arîstokratîk waze valahiya ku li Kurdistanê bi dore zore pêk me, bi CHP'ê digere.



CHP bila hesabê salan bide

R. 3

Heypeyvîn ligel Nezir Palo:

Her helbest, parçeyek ji helbestvan e.

R. 8-9

John Shattuck:

Divê mafên kurdan ên çandî û demokratîk hebin.

R. 4

Zülküf Kışanak:

Şehîdê Deştê Heran:
Embaz Kemal Kılıç

R. 6

Azadiya WELAT



SAMİ TAN

Dilê çend elîfîst û kemalîst-tan bi jinên kurdan dişewite, ji ber ku ew nikarin bi "tirkiyeke herikbar" bipeyivin. Lewre jin û zarokên ku bi zimanê wan nizanin wekî ker û lalan tîn dîtin.

Hêdî hêdî zivistan li pey dimîne. Nişana geşî û xweşiyê bihar, dîsa tî. Bi hatina meha adarê re çalakiyên derdorên demokrat gurtir dibin. Çalakiyên 8'ê adarê ji niha ve dest pê dikin, amadekariyên ji bo van çalakiyan ji zû ve dest pê kirine. Di dema Roja Jinên Kedkar a par de, me ji bîr kiribû ku em Roja Jinên Kedkar pîroz bikin. Lewre ji hinek xwendevanên me rexneyên xwe anîbûn zimên. Di nava gurehiya kar de car caran mirov hin tiştên pir girîng ji bîr dike, ew nayê wê wateyê ku mirov pûte bi wan nade. Em ji niha ve Roja Jinên Kedkar pîroz dikin û dibêjin her bijîn, serfiraz bijîn.

Piştî Roja Jinên Kedkar, Newroz heye. Her çi qas hêzên dewletê xwestin bi êrîşên li ser HADEP'ê rê li ber pîrozbahiyê girseyî bigirin jî, ew nikarin bigihêjin mebesta xwe. Gelê me bi biryar e, wê cejna xwe ya neteweyî bi girseyî û serfirazî pîroz bike.

Digel van mijarên ku dilê mirov geş dikin, hinek qewimînên ku mirovan

diêşînin jî hene. Rewşa kurdên ku li ser erdê welatê xwe bûne penaber, nimûneyeke wiha ye. Hêzên noker, nahêlin ku ew mirov li ser welatê xwe azad bijîn. Zilma nokeran û êrîşên dagirkeran penaberan bégav dihêlin ku ew berê xwe bidin nav erdê Iraqê. Lê rejîma Sedam jî nahêle ku penaberên kurd bikevin nava êrdimî di bin destê wê de. Divê her mirovê welatparêz dengê xwe li hemberî wê hovîtiyê bilind bike, zorê bide Komîsyona Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî da ku çareyek ji bo penaberan were dîtin. Divê kurd rê nedin dagirker û împeryalîstan ku ew penaberan ji hev belav bikin, rêxistîbûna wan ji holê rakin. Lewre digel ew qas zilm û zorê jî, 7 hezar penaber nişanî dinyayê didin ku kurd dikarin karê xwe bi destê xwe bimeşînin. Jixwe tiştê ku tirsê dixê dagirkeran jî ev yek e.

Hêzên dagirker li Bakur jî li pey hinek lîstikan in, hêzên ku her roj gund û bajarên kurdan dişewitînin, mirovan

dikujin, îro bûne ferîşte û 'alîkariyê' li gel belav dikin. A rast ew plan û projeyên piştaftina dayik û zarokên kurdan digerin.

Dilê çend elîfîst û kemalîst-tan bi jinên kurdan dişewite, ji ber ku ew nikarin bi "tirkiyeke herikbar" bipeyivin. Lewre jin û zarokên ku bi zimanê wan nizanin wekî ker û lalan tîn dîtin. Ew kes dixwazin bi bernamêyên piştaftinê kurdan ji wê rewşê "riha" bikin.

Divê mirovên kurd wê ramana eletewş ji binî ve red bikin. Em kurd ne ker in, ne jî lal in. Heke bi rastî jî me hez dikin, bila bihêlin ku em bi zimanê xwe yê maderî zarokên xwe perwerde bikin. Gava dixwazin bibin ku kurd çawa bi zimanekî herikbar dipeyivin, bila demeke kurt berê xwe bidin televîzyona kurdî. Belkî di wê navê de hinekî jî hînî rastiya bûyeran bibin. Her wiha jî ji kurdan waneyên demokrasiyê bigirin. Lewre ji niha ve televîzyona kurdî digel sê zaravayên kurdî, bi sê çar zimanan weşanê dike.

"Mêrê tê kuştin jina qezenckirî ye"

Ferhengok

akam: encam, bandor
azayeti: wêrekî, cesaret
Beramberî: miqabil (karşılık)
berpêbûn: pêkhatin, duristbûn
bi pey: li gorî, li dût
biyanistan: xerîbî
bivê: xwazyarî, dilxwazî
boçûn: dîtin, raman
çandî: zîreat
çaterê: kavşak
çavdê: gözlem
çinayeti: sınıfsal
dabûnê: erf û adet
danîştin: rûniştin
depreş: texteyê nivîsinê
derbirin: ifadekirin
dîdar: hevdiîn
dozîn: içgüdü
duristkirin: çekirin
erdîm: xak, ax
ferîşte: melek
fêname: bawername
gîse: cemawer, kitle
hereşe: gefxwarin, tehdît
hevkat: eynî wextêde
hêvotîn: perwerde, terbiye
hincet: bahane
hîkar: karîger, tesîr
jîmaryar: sayman

kone: qûrmaz, çavbal
lêanîn: adaptekirin
lêhûrbûn: konsantrebûn
lêwêsk: defter
lêqewmîn: mexdûr
mawe: sûre
mêjû: dîrok, tarîx
morîstan: gêrik
nawerast: navîn, orte
nedarî: tunefî, tengasî
nekas: bêkêr
niştecîh: şênî, ahâlî
noker: caş, uşak
qerzdar: deyndar
qeyran: qêran, krîz
palemar: êrîş (saldın)
pûtepedan: özenmek
pêşnûma: proje (taslak)
rêgaçare: çareserî
rihakirin: rizgarkirin
rondik: firmêsk, hêstir
rûdan: qewmîn, pêkhatî
sebare: li ser, derbare
sereser: serre (yüzeysel)
serzemîn: qita
stembar: bindest
şewûz: uslûp, stîl
tembîfîr: dilkêş, cezibkar
tixûb: sînor, lidûd
vebirûsîn: parıldama
yekser: tavilê, hemen
zanav: kunye, sicil
zor: gelek, zehf

HARBÎ SOYLU

8'ê adarê roja jinên kedkar ê cihanê ye.

Salek 365 roj in. Di salekê de tenê rojek para jinan e. Tenê rojekê em ê jinan bînin bîra xwe. Û çend gotinên jiberkirî bêjin û hew... Salekê jinên tim kole bin, rojekê wê azad bin! Ew azadî jî, ku mêr bixwazin wê bidin, ku nexwazin nadin. Ev yek hem di civakên misilman hem jî di yên demokratîk de nayê guhartin. Yanî her tim gotina mêran pere dike.

Kê ev yek kifş kiriye?

Yezdanê mezin!? An di zagonên civakê de ev yek heye!? Dibe ku jinê ev yek la-yîqî xwe dîtibe?

Li ser vê rojê her sal, gotinên xweş tîn gotin. Bi piranî jî van gotinan mêr dibêjin, lê gotinên xwe bi cih naynin.

Çima?

Gelek sedemên wê yekê hene. Her çi qas gelek mirovên birêz ji bo wekheviya jin û mêran xebatên mezin kiribin jî, bi gelemperî mêran nexwestiye jin azad bibin. Xwesteka mêran her dem serdest bûye. Nexwestiye ku jin wekî jinan tesîrê li wan bikin. Ev yek di dîroka civakan de jî hatiye îspatkirin. Ji ber vê

yekê jî mirov dikare bibêje, ji bo ku arîşeyên (problem) jinan werin çareserkirin, girîng e ku pirsgerêkên mêran bîn çareserkin. Heya ku mêr ji qirêjiyên civaka kevn nayê şuştin, ne gengaz e ku jin jî azad bibin. Ev jî şoreşeke civakî ye.

Di destpêka civaka çînî de heya roja îro, her tim yê ku desthilatdar bûye mêr e. Di malbat, eşîr û di karên dewletê de her dem wisa bû-

xurt dibin. Ev jî şexsiyeta mêran lawaz dîke û hestên desthilatperestiyê geş dike.

Her wekî serokatiya tevgera azadîxwaz jî dibêje: "Ev rewş di rastiya me de pirtir balkêş e. Mêrên kurd heyfa bêhêzbûna xwe, bêdesthilatdariya xwe û lawaziya xwe ji jinên kurd distînin." Di vî warî de mirov dikare gelek tiştên din jî bibêje.

Wateya peyva mêr, serwêrî an jî zordarî ye. Di bingeha wê peyvê de gelek tiştên ji demokrasiyê, sosyalîzmê û ji mirovayetiye dîr hene. Ji ber vê yekê jî serokatî dibêje: "Kuştina mêrê derûnî" Tiştê ku tê kuştin nêzikbûna mêr a şaş e.

Nêzikbûna ji evîn û hezîkirinê dîr, ji girêdana nixên mirovane dîr û kuştina şexsiyeta kevneperest e. Lewre heya niha mêr bi dozînen xwe yên ajalî (heywanî) nêzikî jinê bûye. Ew gotinên serokatîyê yên li xwarê wê rewşê xweş tînin zimên: "Min mîrê derûnî yê nav xwe kuşt! Di derûniya min de mîrîti hate kuştin. Ev jî karê min e herî bi dilawerî û cesaret e. Lê bi wê kuştinê re hinek pêşketinên ku pêk hatine, hene. Berî her tiştî min jin qezenc kir. Mîrê ku tê kuştin dibe jina bidestxistî."

Di bingeha peyva mîrîtiyê de, gelek tiştên ji demokrasiyê, sosyalîzmê û ji mirovayetiye dîr hene. Ji ber vê yekê serokatî dibêje: "Min mîrîtiya derûnî ya nava xwe kuşt!"

Civakê mohra mêr û desthilatdariyê her tim di paşla xwe de gerândiye. Hebûna jinê ne diyar e. Jin tenê ji bo dozînen (içgüdü) sewalî hatiye bîra mêr. Di peyva mêr de serdestî heye. Serdestî li pêşiya azadiyê asteng e, bi taybetî jî li pêşiya azadiya jinê. Nemaze jî di civakên kevneşopî de karîgeriya (bandor) li ser jinê zehf e. Ji ber ku civak hatiye perçiqandin. Civak ji zagonên jiyane dîr ketiye. Ji xwe re biyanî bûye. Civakên ku ji xwe re biyanî bibin, hestên nekesiyê li ba

CHP bila hesabê salan bide

Serokê HADEP'a Batmanê Şakir Kakaliçoğlu diyar dike ku CHP di vê gotina xwe de ne ji dil e. Her wiha Serokê HADEP'a Sêrtê Veysel Turhan jî der barê vê yekê de diyar kir ku ev xebat destpêka serdemeke nûhatî ya pişaftinê ye. Wê jî nê kurd di bin navê saziya ÇATOM'a ku bi destê dewletê hatiye avakirin de hînî zimanê tirkî bikin.



din jî nîn e. Kes nikare bibêje kêşeya kurd heye, yê ku bibêje an cudaxwaz an jî terorîst tê îlankirin û tê girtin." Yılmaz Ensarioğlu di dawiya axaftina xwe de daxuyand ku, ji niha ve li ser mebûsên RP'yê û li ser dengên(oy) HADEP'ê partiyên navendî ketine nava hinek hesaban.

Partiyên rejimê ne ji dil in

Serokê CHP'a Batmanê Necati Demirhan jî diyar dike ku wan ji Deniz Baykal gotiye, edî bi polîtîkayên berê çareserî pêk nayê, divê ew polîtîka bîn guhartin. Lewre jî Baykal daxuyaniyeke baş daye û ezrê xwe ji gel û jinên kurd xwestiye. Li aliyê din Serokê HADEP'a Batmanê Şakir Kakaliçoğlu diyar dike ku CHP di vê gotina xwe de ne ji dil e. Ew dixwaze ji bo hîlbijartinê di nava gel de ji xwe re bingehê ava bike. Her wiha Serokê HADEP'a Sêrtê Veysel Turhan jî der barê vê yekê de diyar kir ku ev xebat destpêka serdemeke nûhatî ya pişaftinê ye. Wê jî nê kurd di bin navê saziya ÇATOM'a ku bi destê dewletê hatiye avakirin de hînî zimanê tirkî bikin. Her wiha Turhan dadixuyîne ku, bi reyên Refah û HADEP'ê dixwazin CHP'ê li herême bikin yekemîn partî. Beriya ku CHP ezrê xwe ji gel bixwaze divê pêwîstiyên herêmê bi cih bîne. Ew diyar dike ku bi xwestina lêborînê rûyê CHP'ê paqij nabe, divê ew hesabê salên 1991 û 1995'an dema desthilatdariya DYP-CHP'yê bide. Di wê demê de jiyar kirin dojah li herême. Bi hezaran mirov hatin kuştin bi qasî wê jî gund hatin şewitandin.

Serokê CHP'a Batmanê diyar dike ku alîkarî hatiye dayîn, wan rawestandina şer xwestine û serokê wan jî tu kesî naxapîne ev hewleke nû ye. Li Tirkîyeyê pêşengîya çepgiriyekê nûjen di CHP'ê de wê bi serokatiya Baykal wê pêk were. Ev ne bi raya artêşê pêk tê. Di dawiya axaftina xwe de Necati Demirhan, dibêje ku kêşeya herêmê kêşeyeke etnikî ye, pêwîst e ku bi awayekî aştiyane çareser bibe. Bersiva wan gotinên Demirhan, ji Serokê HADEP'a Batmanê Kakaliçoğlu tê, ew dide zanîn ku li ser daxwaza artêşê CHP ristek

girtîye ser xwe. Kakaliçoğlu balê dikişîne ser vê rastiyê: "Partiya ku di kêşeya kurdî de çareseriyê siyasî pêşniyaz neke, nikare li herêmê jiyana xwe bidomîne." Kakaliçoğlu li ser durûtiya CHP'ê mînakê wîha dide: "Dema ku Adnan Ekmen mebûsê CHP'yê Batmanê bû hingî wezîrê mafên mirovan bû. Ekmen, wê demê ji bo ixlala mafekî li Afrîkaya Başûr daxuyandî dabû. Di heman demê de xebatkarekî bankayê di riya Qubîne de (Beşîr) tevî keçikeke xwe û du lawikên xwe hatin gulebarankirin. Piştî wê jî hatine şewitandin. Li ser vê yekê tu tişt negot. Ev jî bi awayekî hevkarîya sûc e. Ji ber ku hin wezaretên girîng dane CHP'ê dengê xwe nekir." Li gorî Serokê HADEP'a Sêrtê Veysel Turhan di rojevê de marjînkirina HADEP'ê heye.

CHP jî mîna MHP'ê ye

Musa Okçu jî daxuyand ku CHP di bin navê komcivîna jinan de dixwaze tiştên din bike. Li gorî Okçu, bernamayeke CHP'ê der barê herêmê de heta niha nîn bûye, her dem ew der îstîsmar kiriye. Okçu dibêje ku, CHP di çarçoveya çepgiriyê rewşa belangazan ji bo berjewendiyên xwe bikar tîne. Musa Okçu got ku, piştî biryarên 28'ê reşemiyê, leşkeran ferman daye ji bo "saziyan sivil" dest bavêjin meseleyê. Mebûsê Batmanê yê RP'ê Okçu li ser çareseriyê jî dibêje: "Divê nîqaş li ser pirsgirêkên bingehîn werin kirin. Gel ji cih û warê xwe koç kiriye gundê gel hatiye şewitandin. Divê em aramî û aştiyek domdar bînine herêmê. Dewlet gel wekî sîvdarên potansiyel dibîne, serdema berî komarê demokratîr bû. Li Tirkîyeyê qanûna dibistanên taybet heye, îngilîz bi zimanê xwe, alman bi zimanê xwe, frensî jî bi zimanê, lê dema tu bêjî bi kurdî perwerdehî qiyametê radikin." Okçu di dawiya axaftina xwe de diyar dike ku, dema mirov CHP'yê ji destpêka wê ve binirxîne, ji destpêka komarê heta niha di zilma ku hatiye kirin de tiliya wê heye. Ew jî MHP paşverûtir e. Eger di cih de be, ew di bin siya çepgiriyê de kirinên militarîst pêk tîne.

AZAD ALTUN

Kurtenûçe

Serokê Dewletê Lîbyayê Muammer Qaddafi daxuyand ku, bi hin senaryoyan tê xwestin ku gelê Iraqê bibe qurbanê komployekê û ji vê yekê jî Saddam Huseyn û Bill Clinton berpîrs in. Muammer Qaddafi, ji bo serokên Amerîka û Iraqê wisa got: "Hûn her du jî şîrikê vî sûcî ne, kirinên we fen û fût in, Hûn her du jî di vê listikekê de rola xwe baş be cih tînin û we Xelata Oscarê heq kiriye" Ji destpêka qeyranê heta îro ev cara yekemîn e ku, Qaddafi rexneyan arasteyî Saddam Huseyn dike.

Rojnameya navdar a rûsî "Komsomolskaya Pravda" ku li Moskovayê weşana xwe dike, îdîa kir ku mafyaya rûsî, ku li dinayê yek ji xedartirîn rêxistineke tawankar e, li Tirkîyeyê bi milyaran dolarên nehênî(karapara) li piyaseyê belav kirine û ji tevahiya van rûdanan mîrê Tansu Çillerê, Özer Çiller haydar e. Di heman katê de rojname, dadixuyîne ku sala borî 10 milyar dolar û di mehên îsal de jî 2 milyar pereyên nehênî ji hêla mafyayê ve li nav Tirkîyeyê hatine belavkirin. Tansu Çiller, nûçeya Pravdayê wekî nûçeyekê dûrî rastiyê nirxand.

Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (IHD) a Balikesirê, piştî ku di 20'ê reşemiyê de ji hêla polîsan ve hatibû dagirkirin û bi îdfaya ku kovarên lê hatine dîtin qedexe ne, roja 25'ê mehê jî bi hinceta ku ev kovar îlegal in bi maweya 30 rojan hate girtin. Serokê şaxa IHD'ya Balikesirê Bekir Ceylan daxuyand ku, ew dê ji bo ku ev biryar bê betal kirin, serî li dadgehê bidin. Hevkat Ceylan got ku, biryara girtinê li derveyî prosedûra hiqûqî ye û ev girtin berdewama pest û çewsandinên li ser IHD'yê ne.

Platforma Jinan ya Azadî di Hêza Rêxistinî de ye" der barê '8'ê adarê de wê çalakîyên ku di 1-8'ê adarê de bikin, li Baregeha TTB'ya Stenbolê ji bo çapemeniyê daxuyaniyek ragihandin. Li ser navê jinên HADEP'ê, Yekîtiya Malbatên NÇM'ê, Özgür Kadın, Instîtuya Kurdî, TOHAV, xebatkarên jin ên rojnameyên Ü.Gündem û Azadiya Welat, xebatkarên jin ên Özgür Halk, Alternatif, Yurtsever Gençlik û Jiyana Rewşen, BEKSAV, TUAD, GÖÇDER, EKB û DHP, Seroka ÖKD'yê Mürüvvet Yılmaz, da zanîn ku platforma wan ji bo ku rê li ber astengiyên neteweyî, çinayeti û nasnameyî bigire ava bûye.

Van rojên dawîn ligel sefera artêşê ya "alîkariyê", sefera CHP'ê ya li Sêrtê bal kişand. Li ser vê yekê Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu, Serokê HADEP'a Sêrtê Veysel Turhan, Mebûsê RP'a ku hate girtin yê Batmanê Musa Okçu, Serokê HADEP'a Batmanê Dr.Şakir Kakaliçoğlu û Serokê CHP'ê yê Batmanê Necati Demirhan daxuyaniyên balkêş dane rojnameya me.

Li gorî Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu, bi girtina RP'yê re, îşareta girtina HADEP'ê hatiye dayîn. Pişt re ew dide zanîn ku serdana partiyeke siyasî bo herêmê ne tesadûfî ye, dewlet dixwaze vê valahiyê bi CHP dagire. Ji aliyê din ve Ensarioğlu diyar dike ku CHP ne li dervayî biryara 28'ê reşemiyê ye. Ensarioğlu gotinên xwe wiha didomîne: "CHP, wekî ku berî vêga tu mafê gelê kurd nexwaribe tevdiqere. Ew li nav çavê gel dinihêre û derewan dike."

Bingeha pirsgirêkan kêşeya kurd e

Serokê Mazlum-Derê Ensarioğlu dide zanîn Komîsyona Koçê ya meclîsê bangî wan kiriye, lê wî ragihandiyê ku li herêmê kêşeya koçberiyê nîn e. Lewre li herêm koçberbûn tune, neflikirin(sirgûn) heye. Yılmaz Ensarioğlu kêşeya koçberkirina mîna encama kêşeya bingehîn destnîşan kiriye. Ji bo kêşeya bingehîn jî ev gotiye: "Îcar hûn ji bo vê yekê kêşeya kurd dibêjin an kêşeya terorê dibêjin hûn dizanin." Piştî vê axaftinê çend mebûsên DSP'yî ew îqaz kirine û civîn jî provoke kirine. Ensarioğlu li ser kêşeyê wiha dibêje: "Divê mirov navê kêşeyê rast deyne. Navê Kêşeyê kêşeya kurd e. Kêşe bûye kêşeyeke navneteweyî, heger hûn çavê ji xwe ve rastiyê re bigirin, hûn nikarin tiştêkî çareser bikin. Kêşeya aborî dibêjin, lê di des-tê wan de ji projeya DSP'ê ya avakirina gundên navendî(Köy-kent) pêştir tiştêkî

Hevdîtina ligel Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê John Shattuck

Shattuck: "Tiştên ku we gotin, em dê di hevdîtina xwe ya bi Mesut Yılmaz re bînin rojevê û nîqaş bikin." Li ser vê yekê Berdevkê Navenda Giştî ya NÇM'ê Murat Batgî wiha got: "Em jî hurmetê nîşanî sînor û axa herkesî didin. Lê li Rojhilata Navîn heta bigihêje Kafkasyayê kurd dijîn û êdî naxwazin bi şertên qirna navîn dijîn"

Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê û Berpirsê Daîreya Mafên Mirovan John Shattuck, li Amedê, roja 19'ê reşemiyê bi heyetekê ku ji berpirsên NÇM'ê pêk tê re hevdîtinek çêkir. Hevdîtina li Otêla Tûristîk, di saet 8.30'an de dest pê kir û nêzîkî saet û nîvê berdewam kir. Di hevdîtîna de ji NÇM'ê, midûrê şaxa Amedê Remzî Yıldırım, midûrê şaxa Rihayê Murat Gökdağ û li ser navê Navenda Giştî ya NÇM'ê jî listîkvanê Teatra Jiyana Nû Murat Batgî amade bûn. Ji bilî berpirsên NÇM'ê, li ser navê Radyo Karacadağ, ku li Rihayê weşanê dike, xwediyê radyoyê Mehmet Ural û midûrê wê M. Can Toprak tevî hevdîtîna bûn. Di hevdîtîna de, berê Shattuck sedema hatina xwe ya Tirkiyeyê anî zimên û wiha got: "Ez dema ku hikûmeta Mesut Yılmaz hate avakirin, hatibûm vê derê û me bi rayedarên hikûmetê re li ser azadiya fikrê û ramanê û pirsgerêka kurd danûstandin pêk anîn. Wê demê Serok Wezîr Mesut Yılmaz gotibû, wê fikir azad be û em dê meseleya kurd ji aliyê siyasî ve çareser bikin. Mesut Yılmaz wê demê soz dabûn me û gotibû, wê li Tirkiyeyê demokrasiyê xurt bi cih bibe. Ji wê demê heta niha gelek wext derbas bûye. Niha jî ez bi wezîfeya ku Serok Dewlet Bill Clinton bi xwe daye min hatime ku bibînim ku ev soz çiqas hatine cih, rewşa demokrasiyê li Tirkiyeyê çawa ye. Di vî warî ez dixwazim ji we bibihîsim, nêzîkbûna hikûmetê li ser çanda kurdî çî ye? Astengên we çî ne?"

Piştî axaftinê û pirsên Shattuck, Xwediyê Radyo Karacadağ, Mehmet Ural got: "Dewlet hewl û xebatên alternatîf qebûl nake û ji ber wê jî li vê derê mirov nikare qala demokrasiyê bike. Dewletê niha bêsedem cezayê du meh rawestandina weşanê li radyoya me birîye û radyoya me niha girtiye. Ji ber ku em wekî rayedarên vî dewleta ku ji çeteyan pêk hatiye nafikirin." Piştî re midûrê şaxa Amedê ya NÇM'ê Remzî Yıldırım, li ser girtina şaxa Amedê rawestîya û wiha got: "Dewleta tirk naxwaze li bajarên kurd sazîyên kurd hebin. Yanî em tu tiştî jî nekin an jî çalakiyê jî li dar nexin, wê dîsa bîna şaxa me bigirin. Dewlet bê tehamûl e ku em li vê derê şaxekê vekin. Ji her hêlê ve înkarkirinek heye. Ev bi xwe politîkaya bingehîn a dewleta tirk e û di vî helwestê de tu guhartin jî pêk nehatiye. Heta em dikarin bibêjin ku bi awayekî hovane û neqanûnî tenê şaxên me yên li Kurdistanê digirin. Dibêjin hûn dikarin bixebitin, lê divê hûn bi serê xwe bixebi-



tin. Bila gel neyê û neçe vê derê." Piştî jî li ser navê, şaxa Rihayê ya NÇM'ê Murat Gökdağ, li ser girtina şaxa Rihayê wiha axivî: "Dewlet pir qîmetê dide Rihayê. Ji ber wê jî tahamûla wê jî tu tiştî re tune ye. Hem NÇM hatiye girtin, hem sendîka, sazîyên demokratîk û hem jî şaxa Komelaya Mafên Mirovan a Rihayê îsal hatine girtin. Yanî piştî ku Mesut Yılmaz hatiye ser kar hemû sazîyên demokratîk li Rihayê hatine girtin. Ev rewş bi xwe nîşan dide, Mesut Yılmaz sozên ku dane çawa bi cih anîne. Mînak NÇM'ê tenê 14 rojan vekirî ma. Û me hêj tu çalakiyê jî li dar nexistibû, ku bibe sedema girtinê jî. Dibêjin em nahêlin, li ser navê kurdan li Rihayê tiştê hebe. Em tahamûl nakin."

Li ser navê Navenda Giştî ya NÇM'ê jî listîkvanê Teatra Jiyana Nû Murat Batgî wiha axivî: "Em dixwazin vî hevdîtîna wekî eleqedarîya ku Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, nîşanî têkoşîna gelê kurd dide, binirxînin. Divê bê zanîn ku talan û înkarek mezin li holê heye. Û li Tirkiyeyê her çiqas hikûmet diguherin jî, politîkayên dewletê yên li ser pirsgerêka kurd naguherin. Heta jî hêla zordestiyê û talanê ve, ji tecrubeyên hev îstîfade jî dikin. Hikûmeta Mesut Yılmaz jî jî hêla zordestiyê ve, ji hemû hikûmetan îstîfade kiriye û bi wî awayî bi ser me de tê. Ji ber ku artêşa tirk ev wezîfe daye Mesut Yılmaz. Mesut Yılmaz jî biryar daye ku li ser navê kurdan tiştê nehêle. Di vî pêvajoyê de, ev xwe bêhtir nîşan dide. Divê bê zanîn ku li tu dera cîhanê, belkî welatên dagirkirî hebûne, koloniyên dewletên mezin hebûne, lê mixabin li tu dera cîhanê, ziman û çand û folklorê gelekî

nehatiye qedexekirin. Tiştên ku em li ser dixebitin, stranên ku em dibêjin, folklorê ku em derdixînin holê û ji jîbîrkirinê xelas dikin, ne tenê nîrxên gelê kurd in, lê her wiha nîrxên hemû mirovahiyê ne û divê mirovahî lê xwedî derkeve. Tiştêkî din jî heye: "Hûn niha bi kîjan kurdî re bipeyivin, an hunermend be an siyasemedar be an gundî an bajariyek be, xizanek an jî bazirganek be, wê hemû jî belkî bi heman hevokan zordestiya dewleta tirk bînin zimên. Ji ber ku dewleta tirk, tunekirina neteweyekê ji xwe re kiriye armanc û ku li ser navê kurd çî hebe êrîş dike. Êrîşên dawîn ên li ser HADEP'ê û Rojnameya Ûlkede Gündem, divê di vî çarçoveyê de bêne nîrxandin." Batgî, li ser zordarî û çewandinên NÇM'ê jî wiha axivî: "Niha dixwazin tîkiliyên me yên bi gel re qut bikin. Ji ber wê jî, li Kurdistanê şaxên me bi giştî digirin. Li metropolên nêzîkî Kurdistanê jî bi riya girtina salonên çalakiyan, (salonên me yên şaxên Edenê û Mersînê) digirin. Li metropolan jî bi awayekî sembolîk vekirî bihêlin. Hunermendên me ji ser sehnê hildigirin û dibin. Şanogerên me bi tevî kostûmên wan hildidin binçavan. Yanê jî her hêlê bêtahamûliyê xedar heye. Tabî hêj gelek tişt hene ku mirov bibêje. Bi dehan girtin û binçavkirinê hene. Bi dehan tehdît hene.

Murat Batgî her wiha bal kişand ser helwesta Tirkiyeyê ya ji bo weşanên kurdî û axaftina xwe wiha bi dawî anî: "Wezîrên dewleta tirk her tim rojname û kovarên kurdî dixin çenteyê xwe û di platformên navneteweyî de derdixin û nîşan didin ku li Tirkiyeyê bi rihetî xebatên li ser kurdan tên çêkirin. Divê bê zanîn ku

ev durûtî û dereweke mezin e." Di qanûnên dewleta tirk de, li ser navê kurdan tiştêk nîn e, lê ji bo astengkirina van xebatan hemû tedbîr hatine girtin. Bi kurtasî ez dikarin bibêjim encama sozên ku Mesut Yılmaz dabû we, ev e." John Shattuck, di dawiyê de memnûyet û kêfxweşiya xwe ji bo hevdîtîna anî zimên û wiha got: "Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, naxwaze sînorên dewleta tirk xera bibin. Û alîkariyê dide parastina sînorên Tirkiyeyê û hurmetê nîşanî sînorên herkesî dide lê ji hêlekê ve jî alîkariyê dide ji bo ku demokrasiyê xurt li Tirkiyeyê çêbe. Û dîsa alîkariyê dide xebatên gelê kurd ên çandî û hunerî. Bi vî mebestê, Amerîka alîkariyê dide xebatên we û zordestî û çewandinên li ser we şermezar dike." Shattuck di dawiyê de wiha got: "Tiştên ku we gotin, em dê di hevdîtina xwe ya bi Mesut Yılmaz re bînin rojevê û li ser nîqaşê bikin." Li ser vê yekê Berdevkê Navenda Giştî ya NÇM'ê Murat Batgî wiha got: "Em jî hurmetê nîşanî sînor û axa herkesî didin. Lê li Rojhilata Navîn heta bigihêje Kafkasyayê kurd dijîn û êdî naxwazin bi şertên qirna navîn (Ortaçağ) bijîn."

John Shattuck piştî bi Platforma Demokrasiyê ya Amedê re hevdîtînek saz kir. Di 20'ê reşemiyê de jî, li Enqereyê, bi Mesut Yılmaz û Akın Birdal re jî hevdîtînek çêkir. Shattuck, piştî Leyla Zana, Hatip Dicle, Orhan Doğan û Selim Sadak li girtîgehê ziyaret kir û bi wan re jî der barê pirsên kurd û demokrasiya Tirkiyeyê de axivî.

Çavdêriyên li ser Kampa Nînovayê

Digel ew qas zilm û tengasiyê dîsa jî li ber xwe didin û morala wan bilind e. Penaber karê xwe bi saziyên ku bi destê xwe afirandine.

Kurdistan
lives

Piştî qêrana kendavê hêzên dagirker planên dagirkirina Musul û Kerkûkê kirin, 7 hezar penaberên kurd ên li kampa Nînovayê berê xwe dan herêma di bin kontrola rejîma Saddam de, lê hêzên rejîmê destûr nadin wan, niha hê jî penaber li ser sînora. Komek kesên welatparêz jî ji bo piştevaniya penaberan li Silêmaniyê dest bi greva birçibûnê kirine.

Wekî tê zanîn ji 15 hezar kurdên li Kampa Etrûşê, 7 hezar li ser zilma hêzên noker û sersariya Komîsyona Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR), di adara 1997'an li herêma tampon a di navbera Iraq û Başûr de bi cih bûbûn.

Di hejmara 26'an a Kurdistan Report de çavdêriyên heyeteke biyan ên li ser kampê cih girtine. Di kovarê de li ser kampê du nivîs hatine weşandin, yek ji wan jî aliyê Mustafa Canikoğlu û Jörg Hilbert ve hatiye nivîsîn û ya din jî çavdêriyên Andrew Penny ne û ji hêla Aysel Özcan ve hatine wergerandin. Li vir em dixwazin cih bidin çend tîbiniyên wan:

Berpirsê UNHCR'yê yê Dohukê Bonshani Sangnai qala gelek projeyên alîkariyê dike, ji xeta kişandina avê bigire, heta konên ku li dijî zivistanê bikêr in.

Lê dema heyet diçe kampê dîmenekî din derdikeve pêşberî wê, digel zilm û zora PDK'ê, birçibûn û nexweşî heye. Li gorî agahiyên ku komîteya kampê dane, 40 zarok ji nexweşiyên mîna tifo û dizanterî mirine, li kampê bijîşk nîn in, penaber nikarin herin nexweşxaneyên li Dohukê. Li aliyê din dermanên ku UNHCR dide mêjûya 2-3 sal berê li ser e, ji van gelek zarok ji ber derman jiyana xwe ji dest didin. Digel vê yekê, PDK'ê jî derketina derveyî kampê qedexe kiriye. Kesên ku guhê xwe nedin vê qedexeyê jî tîn kuştin. Bo nimûne di 30'yê tîrmehê de penaberek ji hêla hêzên PDK'ê ve hatiye kuştin, du penaber jî bi xedarî birîndar bûne.


Alîkariya UNHCR dide tiştekî komîk e; serê her mirovî mehê 9 kîlo arvan, 900 gr. rûnê nebatî, 300 gr. şekir, 900 gr. nîsk, ji çaran sisîyê penaberan di rewşa xelayê de dijîn. Hêzên PDK'ê jî ji bo rewşa wan xerabtir bikin çî ji wan tê dîkin. PDK 700 meşînên penaberan dizîne.

Ava kampê di tankerên ku pê petrol jî tê ragihandin de tê, ew jî dibe sedema nexweşketina penaberan. Li kampê hezar heb zarokên di jiyê (ömür) xwendekariyê de hene, lê li kampê alavên perwerdehiyên, ên mîna depres, pênuş û lê-nûskê peyda nabin. Li kampê 30 heb

mamoste hene, wan ji bo alavên perwerdehiyê serî li UNHCR û UNICEF'ê dane, lê encamek bi dest nexistine.

Kesên ku çavdêrî kirine, didin zanîn ku penaber digel ew qas zilm û tengasiyê dîsa jî li ber xwe didin û morala wan bilind e. Penaber karê xwe bi saziyên ku bi destê xwe afirandine dimeşînin, di nav wan saziyan de dadgeha gel, dibistan û hêzên ewlehiyê jî hene. Berpirsê kampê sedema kêfxweşiya xwe wiha rave dike: "Li vir zarokê bakurê rojavayê Kurdistanê li dibistanê bi zîmanê kurdî perwerde dibin. Li vir em dikarin bi zîmanê xwe bipeyivîn û hemû pirsgrêkên xwe bi awayekî serbest nîqaş bikin."

Di nav penaberan de kesên ku lêzîmên wan di nav refên gerîla de ne gelek in û ew bi van jî serbilind in. Bo nimûne jinika bi navê Taybet dide zanîn ku ew berî çend mehan hatiye kampê ji ber ku ji êrîşên hêzên tirk bêzar bûye, lewre mêrê wê ev 9 sal in gerîla ye, niha bûye fermanîdar û ew bi wî serbilind e. Dîsa penaberê bi navê Remezan Şivan jî du zarokên xwe şandine nav refên gerîla, lawê wî şehîd ketiye û keça wî ya ku ji



sala 1989'an bi vir de gerîla ye, niha bûye fermanîdar. Ew jî bi vê yekê serbilindiya xwe diyar dike.

PDK û UNHCR ji 15 mirovî 7 hezarê mayî ji hev belav kirine. Ji wan 800 heb li Kampa Sumailê hatine bicihkirin, aqûbeta yên din nayê zanîn. Heyet diçe serdana wan jî, rewşa vê kampê ji Nînovayê ne baştir e, mirovên li vir, ji aliyê moralê ve jî tîk çûne. Ew dibêjin: "PDK û UNHCR'ê gelek soz dan me, lê yek jî pêk nehat."

NAVENDA NÛÇEYAN

Kurd û firsend

FAYSAL DAĞLI



Rejîma Enqereyê bi amadekariya dagirkirina başûra Kurdistanê, xeyalên rojên bi ihtîşamê împaratoriye dike. Bi destxistina çavkaniyên petrol û ava Başûr ji bo xwediyanê ve rejîmê armanceke pîroz ku bi sonda neteweyî (Mîsak-î millî) hatiye girêdan. Ji ber vê yekê car caran bi navê Kerkuk û Musulê dinalin. Ev nalîn hîsteriya ve sondê ye ku xwe dide xuyan.

Bi krîza dawîn ku DYA li Rojhilat derxist, rejîma Enqere careke din mîna firsendekê dît ku xeyalên rojên muhteşem bike, yanê berê xwe bide bîrên petrolê û ava çeman.

Lê, di hesabên Enqereyê de, hin guhartin çêbûn û hedefên sereke guherîn. Van guherînên ku di çend salên dawîn de berpê bûn, siyaseta rejîmê ber bi cihêkî din ve bir.

1- Rejîma genaralan di bin tehdîda tîkoşîna neteweyî de ye. Şerê gerîla xesarên mezin dane cîhaza leşkerî ya

dewletê. Ji ber vê yekê, di êrîşên Başûr de hedefa sereke bûye bêtêsîrkirina artêşa gerîla. Operasyonên ku artêşa tirk li Başûr li dijî gerîlayan daye destpêkirin diçe ta salên 1983'yan. Di salên dawîn de bi rejîma Bexdayê re peymanî "şopandina germ" hate morkirin û bi dehan car ketin başûrê Kurdistanê. Piştî rapêrîna 1991'ê jî axa Başûr bû qada tatbîqata qomando û balafirên tirk.

Yanê li başûr armanca nêzik a dewleta tirk, tîkbirina şervanên kurd e. Ji bo vê yekê, bi operasyonên xwe ta kirêkirina hêzên Mesûd, damezirandina herêma tampon, heta bi YNK re pevçûnê gelek taktîkên rojane bi kar tîne.

2- Armanca dîrokî a rejîmê bi destxistina Kerkûk û Musilê ye. Rezerwên cîhanê ê petrolê jî sedî 10 li Kurdistanê ne, û hin sed salên din jî dest dide hilberînê. Sultanê Osmanî dema ku di dawîya 1800'î de, ku petrol li Kerkûkê hat derxistin, ev dever li ser xwe tapû kir; û bîngeha sonda neteweyî avêt. Piştî şerê yekemîn îngilîzan Başûr dagir kir. Kemalîstan ku komara xwe damezirand dîsa ji bo paşvegiştina Kerkûk û Musilê bi îngilîzan û ereban re ketin pêşbaziyê. Lê bi ser neketin û mecbûr man ku Peymana Lûzan û Musilê mor bikin. Helbet heta firsendekê! û di hemû firsendan de jî leşkerên xwe li ser tixûbê Başûr dan civandin. Cara yekemîn di sala 1958'an de,

paşê di dema şerê Îran û Iraq de, di salên 1983 û 1987'an de û di sala 1991'ê de û nihayet di sala 1998'an de.

DYA, hewldanên generalên tirk, bi qasî ku bi berjewendiyên xwe re girê bide mazûr dibîne. Carina wan ji bo dagirê teşwîk dike, carna jî ji bo ku bide sekandin tehdîd bike. Helbet DYA ji bo ku ji van çavkaniyan bi xwe sûd bigire hereket dike. Krîza dawîn ku derxistine jî, li ser berjewendiyên şirketên petrolê ne.

3- Çavkaniyên avê, ku ber bi Erebiştanê ve diherikin û jiyan didin axa Rojhilata Navîn jî, her diçe bihatir e. Generalên Enqereyê bi taybetî çavên xwe berdane korîdora deşta Rewandûzê û bendawa Bexmê. Ku ew vira bigirin, dikarin hemû çeman kontrol bikin.

4- Artêşa tirk bi vê amadekariyê dixwaze ber li planeke DYA jî bigire, ku ew dewleteke kurd danemezirînin. An jî rê li ber tevgerê kurdan bigire ku, ew bi serê xwe hereket neke.

Helbet ne kurd, ne tirk, ne DYA û ne jî rejîma Bexdayê di rewşên wisa de hemû kevirên xwe nakin cêbekî. Her yek xwedî gelek planan in. Di siyaseta dewletan de berjewendî hene, ne dostanî. Tê hêvî kirin ku, kurd jî êdî piştî niha tenê berjewendiyên xwe bidin ber çavan û ji bo bidestxistina firsendekê bibin yek.

Şehîdê Deşta Heran; Embaz Kemal Kılıç

Ewro şarê Rihay bêisotan û bêşamî, nêwazenê çiyê sero vinderê. Şewra ra heta dihişt şamiya şanî sero wextê xo ravêmenê. Ebi texmînê min, nîmeye kuştanê ma, îsotan û şamî sero virazyayê.

Welat reyeno, şarê Kurdistan paykewnê, Şirnex û Cizîrey veşenê, dişmen adir verdeno kokê ma û ma qir kenê; ebi zanayina min nê qiseyan ra jew jî nêkewno goşê şarê Rihay. Ez zana ke, zey sûkanê bînan tiya de jî, şarî miyan de xeftiyayînê welatperwerinê estê. Emser keylê embazî na şarîstan de şehîd kewtî.

Jû fin xo bi xo fikiriyena û Brahîm Xelîlî û Nemrûdî ana çimanê xo ver. Ez ewnena ke, kesê jî Nemrûdî ra hez nêkenê, la belê Brahîm Xelîlî jî qe rind nêsilasnenê. Ewro bê gola Brehîm Xelîlî û maseyan çiyê jî, ê qewmî ra nêmendê. Ser diwêş mengî qandê rûmet girotin, şar ebi qelfana çosme yê nê golî ra şinê û yenê. Nê merdiman ra jewê ci jî nêvano 'Nemrût kam o, Brahîm Xelîlî kam o û ewro kamî zey Nemrûdî şarî rê hesûrey kenê; kamî zey Brahîm Xelîlî adirî de ebi weşîna xo ya veşenê? Nêvanê ewro jî dawa Brahîm Xelîlî û Nemrûdî dom kena û her gi roj seranserê welatî de tewrî gird bena. Zek nêvanê Brahîm Xelîlî şarê ma wo û Nemrûdî jî dewlata Roma Reş a. Ma yê hetanî çimhal nê adirî miyand bê û biveşê."

Özgür Gündem de heremê xeftiyayînê ma nezdiyê pê debi. Coka ma vêşî pêsero şî û ameyê. Wexto ke ez şiyê Rihay, ey hetek de; wexto ke o ameyê

Adna, mi hetek de mendê. Ma çend ke ameyê pêhetek, rewşê şarê xo sero qisey kerdê. Goreyê diyinên mi, xeberê ey heme çî ra biyê. Ê qiseyên ke cor de nûsyayê, pêdiyînên ma de, embaz Kemalî ardê ziwan. Ma wasten û fikirê xo, pê raqê nênimîtê. Embaz Kemalî weşî û nêweşiyê ma ebi zerya pakîna û çend ke ci des ra ameyê jî, ê raştîyê xo miyan de ardê ziwan. Ma Adna, Riha û Amed de piya mendim. Embaz Kemalî giranîna xo, qe xo dest ra nêviradayê û tim û tim a giranîna xo dayê çosmeyê xo û şenikîn ra jî qe hez nêkerdê. O çend finî girotya binçim, la belê hend girotya ke amorê ci nîno min vîrî. Ancî o, her gi fin tayna veraver şiyê û qandê lecê waliyê Rihay Ziyaeddin Akbulutî xo şirêgnayê. Çirê ke ey çend finî, pêsero, dazanayînê xo de wina vatbi: "Eke çiyê bêro min sere mesûlê ci waliyê Rihay Ziyaeddin Akbulut o. Eke Akbulut, qandê mergê min destûr nêdo polîsan, oyo çiyê jî meyro mi sere."

Embaz Kemalî weşîya xo de namê kiştîyê xo eşkere kerdbi. Ê rojan de her gi roj jew embazê ma şehîd kewtê. Coka ma heminan jî jew cayê de, kontrayan ra guleyê mergî pawitê. Ebi zanayina min, embazanê ma heminan jî xo mergî rê kerdbi hadre. Rastî o çax ma heminan hetek de merg bibî çiyê bêmahne. La belê, embaz Kemalî tewrî mahne nêdayê mergî û wexto ke ma vatê: "Embaz miqayitê xo bi" Ey wina verpîrsê ma dayê. "Şoreşê şaran qe cayê de jî, bê mergê şoreşgeran nêrasawo sere û şoreş jî nêvirazyawo. Coka ma yê bilaheq nêmirenê. Vêşî

mekewê kaxûdê mergî embaz."

Embaz Kemalî kiştê ra roj-namegerin kerdê û kiştê bîn ra jî, şarê xo miyan de lecê nêzanin û xizanin dayê. Çend ke ci dest ra ameyê, raya raşt mûsnayê nêzanan. Wêranşahr ra, Sirûc ra, Sêwreg ra û şarîstanê bînan ra û dewan ra kam ameyê ci hetek heminan ra jî pêdestîn (paştigirotin) kerdê. Wexto ke ey karê jew nêzanayînê kurdî ardê ca, zaf biyê kêfxweş. Jew fin qandê nê çiyayî heta Entap û Adna jî ameyê. Cok ra embaz Kemal, şarîstanê herêma Rihay heminan de jî silasniyaye û zaf hez kerdebi. Wexto ke embaz Kemal şehîd kewt, nê şarîstanan ra zaf mardimî ameybî dewa Kulunce.

Embaz Kemalî, rojê jew nêweş ardbi Adna. Ma ewna ke, şewra rew, Kemal jew mêrdêk û lajê ci ya kewt zereyê büroyê Adna. Ma verî xeyrweşîna pê kerd û peyra jî mi ci ra vat: "Kemal, no mêrdêk çiyê to yo?" Kemalî na persa min ra bibi kêfxweş ke ewna mi ra, wiya û peyra jî wina vat: "Ez çî zana embaz, merdimê to yo, çimke o jî Sêwreg ra wo. La belê tîrşikçiyayî ra niyo, welatperwer o. Embazan nameyê min dawo ci. Lacê ci zaf nêweş o. No panc rojiyê ke mayê lăcekî nêweşxananê Rihay de çarnenê. Vizêr doxtoran sewkê ci vet Adna. Min ewna ke mêrdêko fiqare wo tirkî jî nêzano û kesê ci jî çinoyo. Coka ez eya amewa Adna. Eke silasnayeyê ma, estê wa marê hetkarin bikirê, karê ma rew biqediyoyê û ma ageyrê Riha." Wexto ke Kemalî nê qisey ardê ziwan, vaten ke ca de bo, ridê ci ra rindey biyê vila. Jew merdim hend, şeno dekewo destê şarê xo û hend şeno rûmet bido şarê xo. O roj, ez keylê kewta bandorê embaz Kemalî bin. Kiştê pêdestîn ra embaz Kemal qe mêtjê min ra nêweşiyeno.

Jû jû fin, ma qandê weşîna xo aqil dayê pê. Ma pê ra vatê: "Weş bewn xo ra nê rojan de kontrayê rind xeftiyayî û zey qesaban kewtê ma miyan."




Wexto ke nê qisey mabêndê ma de ravêrdê, ey her gi fin jî wina vatê: "Embaz ters nêşeno mergi verkewo. Bê mergî jî zaf çî estê. Wexto ke merg bêro, ma yê jî hendê xo verbidê. Jew fin merg jî, kesî rê lazim beno." Embaz Kemal qe jew rojê jî çiyê ra nêtersa û nêtersayê. Raştî kes şeno wina jî vajo, bandorê tersî qe nezdîdê embazî nêbiyê. Çimke zerya ey zaf gird bi û weşîna ci bawerîna pir bî. Ey weşîna rûmet ra kêfxweşin girotê.

Embazê ma wo delal, rojnameger û parêzgerê heqê merdiman Kemal Kılıç, 18'ê reşemîya 1993 de, deşta Heran de, raya dewa Kulunce ser de ebi destê qontrayên dewleta Tirkiya şehîd kewt. Kontray verî wazenê, Kemalî biremnê, la belê embaz weş xo ver dano. Wexto ke dabenceya hîrê gulê nanê pa. Embaz hîrê gulana şehîd kewno.

Wexto ke embaz Kemal şehîd kewt, ez jî Adna ra şiya Riha. Çi heyfo ke, dewleta tirk meytê ey nêweşxanî ra ebi zorê xo ya girot û berd dewa Kulunce. Ma nêşa qandê embazê xo, merasimê jî virazê.

Ma yê to zey Muhsin Melikî, zey Eyüp Gököğlü yî, zey Birayanê Santemuran û zey Hüseyin Denizî qe xo vira nêkerê embaz.

ZÜLKÜF KIŞANAK



Li Welatê Min

*Li welatê min
rojname lal ji diya xwe dibe
li welatê min radyo ker ji diya xwe dibe
li welatê min televizyon kor ji diya xwe dibe
ewên bixwazin li welatê min
ew bi saxî ji diya xwe bibin
wan lal dikin û dikujin,
wan ker dikin û dikujin,
wan kor dikin û dikujin,
li welatê min
(Şêrko Bêkes)*

Cengîz al hilda em tu car danayinin. Riya me yek e.

Em di şes saliya şehîdketina Rojnamegerê kurd Cengîz Altun de, hemû şehîdên şoreşê bi bîr tînin.

Cengiz Altun

(9 ûrmeh 1968-24 reşemî 1992)

Riya we wê pêşiya me ronî bike.

**XEBATKARÊN ROJNAMEYA
AZADIYA WELAT**

□ 4 Adar 1981:

Ali Erek li Girtîgeha Amedê şehîd ket

Ali Erek, ku ji doza Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK') li Girtîgeha Amedê girtîbû, di roja 42'yan a rojîya birçûbûnê de, ji aliyê gardiyan û leşkerên tirk ve bi kotek û îşkenceyên xedar hate kuştin. Girtiyên PKK'yî ji bo ku pest, kotekî û zilma li ser xwe ragihînin raya giştî ya cîhanê û rê li ber van kirinên hêzên leşkerî bigirin, dest bi greva birçûbûnê kiribûn.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 2 Adar 1979:

Mele Mistefa Barzanî çû ser dilovaniya xwe

Mele Mistefa Barzanî di avabûna Komara Mahabadê de piştigiriya Qazî Mihemed kir. Di salên 1961-1963'an de li dijî artêşa Iraqê şerekî dijwar meşand. Piştî ku Abdulkerîm Qasim bi derbeyekê li Iraqê bû desthilatdar, di sala 1974'an êrişên xedar birin ser hêzên Mele Mistefa Barzanî. Di vî şerî de balafir û firokeyên Urîs jî gundên Barzanan bombebaran kirin. M. Mistefa Barzanî di sala 1974'an de li Amerîkayê çû ser dilovaniya xwe.

Înstîtuya kurdî rêveberiya xwe ya nû hilbijart

Her wekî ku tê zanîn, berî vê demeke kurt, Înstîtuya kurdî ya Stenbolê komcivîna xwe ya pêncemîn li dar xistibû. Di vê komcivînê de lijneya giştî ya kargerîyê ya înstîtuyê hate hilbijartin.

Di 20'ê meha reşemiyê de, li saet 12.00'an de, li avahiya înstîtuya Kurdî ya Stenbolê, endamên lijneya kargerîyê li hev rûniştin û rêveberiya nû ya înstîtuyê hilbijartin. Li gorî encama vê hilbijartinê Hasan Kaya wekî serokê Înstîtuyê, Sami Tan wekî cîgirê serokê înstîtuyê, Mele Kerem Soyly wekî jîmaryar, Mulazim Özcan û Nijad Yarak jî ji bo endamtiya birêveberiyê hatin hilbijartin.

Li aliyê din heman rojê, ji bo ji nû ve sazîkirina

beşên zimên û wêjeyê biryar hate girtin. Hat ragihandin ku, wê endamên van beşan di 27'ê reşemiyê de, ji bo diyarkirina warên xebatê û karbesiyê bicivin. Li gorî vê, di civînê de her beş dê berpirsiyarê xwe yê giştî hilbijêre. Her endam jî dê peywirekê hilbigire. Bi pey agahiyên rayedarên înstîtuyê, di binê banê beşa zimên de warên wekî; xebata ferhengê, rastnivîs, lêkolîn, semîner û perwerdekarî hene. Di beşa wêjeyê de jî, xebata werger, lêkolîn û lêgerîn, semîner û perwerdeyê hene.

Li ser xebatê û pêşnûmayên înstîtuya Stenbolê, Serokê înstîtuyê Hasan Kaya pirsên me bersivandin. Kaya qala Kovara Zend kir û got ku ew dixwazîna birêkûpêkî weşana Zendê bidomînin. Hasan Kaya warên xebatê yê înstîtuyê jî wiha rêz kirin: "Wê ji bo berhevkerin û lêkolînê beşa zargotinê hewldanên xwe gur û geştir bike, der barê aboriya Kurdistanê de lêkolînên bîn kirin, birêkûpêkîkirina perwerdehiya ziman û wêjeyê û gihandina kadroyan, çapkirina gelek pirtûkên ku mijara wan ji hev cuda ye" Kaya her wiha bal kişand ser têkiliya ronakbîrên kurd û da zanîn ku ew dê ji bo xurtkirina yekîtiya nivîskarên kurd têbikoşin. Li aliyê din wekî tê zanîn ev demeke înstîtuya Stenbolê ji bo amadekirina ferhengokeke kurdî xebatên xwe didomîne. Hasan Kaya li ser vê yekê got ku ew hêvî dikin di nav havîna bê de ferhengê biweşînin. Her wiha wî got ku wê lêkolîner Torî li ser dîroka kurdên Bakur xebatekê bike.

Di dawîya axaftina de Kaya sedemîn salvegera rojnamegeriya kurdî bi bîr xist û daxuyand ku, wê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji bo sedemîn salvegera rojnamegeriya kurdî çalakîyên wekî pêşangeh, panel û hwd. li dar bixe.


A. WELAT/ STENBOL



Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya

ÇAVDÊRÎ

Her mirovê destê wî
qelem digire ne pêwîst
e kovarekê derxe



MÎRHEM YÎÇÎT

Duh (22.2.1998) Refîq Sabir li Înstîtuya me bû. Ji bo pêşangeha peykertirase kurd Nezir Xeylanî hatibû. Refîq Sabir şair û lêkolîner e û ev çend sal in berpirsiyarê Kovara Rabûnê ye. Sabir li pêşangehê zêdeyî saetekê temase kir, di ber re ji Nezir pirsên xwe pirsîn, sohbet kir û dîtinên xwe vegotin. Piştê ji bo vexwarina qehweyekê em derbasî medbexa Înstîtuyê bûn. Em çar kes bûn. Serkan Birûsk, Xalid Reşîd û Mehdi Caf jî hazir bûn. Mehdi jî başûrê Kurdistanê ye û şanogerekî jîr û sexî ye. Xalid Reşîd hunermend e, endamê Akademiya Kurdî ye û niha di kanalekê televîzyonê ya swêdî de, bi navê "Opna Kenalen" e her hefte nîv saetê programekê çêdike. Ewîl me hinekî behsa programa Zanîngeha Medê kir. Lewre Refîq Sabir berî bê ba me, ji bo Zanîngeha Medê çend ders pêşkêş kiribûn û ji wir hatibû Înstîtuyê. Mesafeya nav van her du dezgehên me bi trêne Stasyonê e, ji Stadhagen heta bi Firdîshemplan e. Bi piyan jî 10-12 deqîqe ya heye ya tune ye.

Sohbeta me dirêj kir. Em hinekî li ser sedsaliya rojnamegeriya kurdî sekinîn. Li ser çalakîyên pêwîst me dîtin û fikrên xwe gotin û me pêşniyazên Sabir girtin. Hê piştêtir em hatin ser hin kovarên ku li derveyê welat û nemaze li Swêdê derdikevin. Li ser masayê me Kovara "Kontrakt" hebû. Kontrakt berî bi du mehan derketiye. Berpirsiyarê wê Nasir Hefîd e. Nasir jî malbata Şêx Mehmûdê Berzencî ye û berî vê kovarê careke di li vir, li Swêdê bi navê "Jidayikbûn" kovarek derxistibû. Piştê çend hejmaran weşana kovarê rawestiyabû. Berê axaftina me hinekî li vê kovarê û nemaze yê bi zaravayê soranî derdikevin siwar bû.

Li Swêdê heta niha gelek kovar belbûne û windabûne. Bi qasî kovarên ku tên weşandin, yê ku weşana wan rawestiyayî jî hene. Wek Serdema Nû, Jidayikbûn, Xermanan, Wan, Şano û Sînema û hwd. Beşek ji kovarên îro jî li ber ruh didin, li dawîya temenê xwe nêzik dibin. Tu hatin û pêşerojekê wan tune ye. Dê çend hejmarên din derkevin ne diyar e. Refîq Sabir hinekî behsa rewşa Kovara Rabûn kir: "Rewşa kovarê ne baş e, ji her hejmarê bes li dora 100 hebî tê firotin. Wiha here ew jî dê ji niha û ne dîr biterpile û têkeve nav kovarên îro ne li jiyane ne."

Dawîya dawî em gihîştin neticeyekê wiha ku, kovar derxistin hergav ne pozîtîf e û ne xîzmet e. Heta ne dewlemendî û ne jî rengarengî û plûralîzm e jî. Mirovê nivîskar û her kesê ku destê wî/wê qelemê digire ne pêwîst e kovarekê derxe. Mirov dikare di kovareke nêzikî dîtin û felsefeya xwe de binivîsîne. Kovar derxistin divê bersiva hewcedariyekê bide. Ev fikir, zêdetir tê pejirandin. Ev tendens û ev meyl dê nivîskarên kurd li dora çend kovarên mezin, xurt û temendirêjtir bike kom. Ev jî xuya ye bi dilê xwendevanên û ji aliyê nivîskarên ve jî piştigiriya wê ji berê pir zêdetir tê kirin. Di wextekê de ku heta niha çend kovar bûne malê dîrokê û beşek ji yê mayî jî li ber sekeratê ne, her wiha di demekê de ku êdî di vî warî de jî zaroktiya hebû li dû me maye û tecrûbeyê fireh heye, derxistina kovarên nû bi mebestên ne rewşên bîrî, neteweyî û gelekî subjektîv divê bê terikandin. Kovarên ku hene divê bêne xurtkirin, em divê li dora kovarên hene bicivin. Redaksiyonên kovaran jî divê ji vî re bibin alîkar û ji bo qelemên cur bi cur ji hergav sîngfirehtir û bitolerantir bibin.

Çalakîyên Roja Jinan (1-8) ên Platforma Jinan a Azadî di Hêza Rêkxistî de ye:

01 adar, 1998: Saet 10.00: Deklerasyon. Cih: Li ber Lîseyê Galatasarayê. Saet 18.00: Ji tunelê heta Taksimê meşa bi meşale.

02-08 adar, 98: Vekirina Pêşangeha wêne, peyker, û fotografan. Cih: Beksav (Kadıköy)

03 adar, 98: Serdana girtiyên jin ên li Girtîgeha Ümraniyeyê û daxuyaniya çapemeniyê.

04 adar 98: Serdana girtiyên jin ên li Girtîgeha Çanakkaleyê û daxuyaniya çapemeniyê.

05 adar, 98: Bi Sazûmankariya Komîsyona Jinên HADEP ên Navenda Stenbolê şahî. Saet, 13.00. Cih: Salona HADEP'a Bağcılarê.

06 adar, 98: Serdana girtiyên jin ên li Girtîgeha Bayrampasayê û daxuyaniya çapemeniyê.

07 adar, 98: Piştigiriya Dayikên Şemiyê. Saet, 12.00

08 adar 98: Miting.

KOMÎSYONA JINAN A HADEPA STENBOLÊ
KOMELEYA JINÊN AZAD
KOVARA YAŞAMDA ÖZGÜR KADIN
NÇM
YEKÎTIYA MALBATÊN MEZOPOTAMYA
JYANA REWŞEN
ENSTÎTUYA KURDÎ
XEBATKARÊN JIN ÊN ÛLKEDE GÜNDEMÊ
XEBATKARÊN JIN ÊN AZADIYA WELAT
XEBATKARÊN JIN ÊN KOVARA ÖZGÜR
HALKÊ
XEBATKARÊN JIN ÊN KOVARA YURTSEVER
GENÇLIK
XEBATKARÊN JIN ÊN KOVARA

ALTERNATIF
JINÊN ENDAMÊ TUADÊ
JINÊN ENDAMÊ GÖÇ-DERÊ
JINÊN PARÊZER ÊN TOHAVÊ
KEDKARÊN WELATPARÊZ
YEKÎTIYA JINÊN KEDKAR
PLATFORMA MAFÊN DEMOKRATİK
JINÊN DEMOKRAT ÊN NÛ
EKB SARIGAZI
BEKSAV
KOMELEYA CAN KADINLAR

Helbestvan Nezîr

Her helbest, parçe



Nezir Palo kî ye?

□ Rondikek sar e, di çavên helbest- teke gêjokî de. Bi diwîta birînekê vekirî dinivîsîne û di sibeyên tirsonêk de dixwîne. Nezir Palo hîna li xwe digere.

Qîrîn ji 44 helbestan hatiye avakirin. Nezir Palo xwe di kîjan helbestê de dibîne?

□ Her helbest, parçeyek ji helbestvan e û helbestvan jî zarokeke di helbestê de... Wiha jî, em ji hev nabin.

Nezir Palo ji bo çi dike qîrîn?

□ Qîrîn... Nevêtin (nexwestin) e, nevêtin e ji heyîna bêwate re. Nevêtinê ji bend û sînoran re. Nevêtinê ji bêdengî û pûçbûnê re.

Qîrîn dengê yekemîn e di jiyane de, ji mirov bi der hat û ta niha bi dertê.

Dema ku zarok ji dayika xwe dibe, berî her tiştî dike qîrîn. Û nevêtinê xwe di rûyê cihanê de dipeqîne. Bi hemû ziman û zaravayên cihanê, qîrîn bi yek rengî û yek wateyê ye. Qîrîn zayîneke durist û derbirîneke rastgo û bi ços e. Balkêşa mirov hişyar dike û bivetiyê eşkere dike. Qîrîn hezjêkirineke bi lez e û hewldaneke bêtîp e. Loma jî... ez dikim qîrîn.

Wekî helbestvanekî, di vê şevreşiya birakujiyê de, ji bilî qîrînê tu dikarî çi bibêjî..?

□ Birakujî goreke vekirî ye, ji gelê me re. Serekdaran em ji xwe re, kedî kirine. Her demekê, me dihevojin hev. Lê ji berî serek û fermanbaran, tawanbariya vê yekê, di stûyê gel û rewşên birênd me de ye..Çimkî bi hev re, di rûyê birakujiyê de, me nekiriye qîrîn û nevêtinê xwe jî me negotiye.

Birakujî nifîrek e, li gelê me hatiye kirin. Ji berê ve tê gotin: "Kurd gurê hev in".!! Ka carekê jî, tenê carekê, em birayê hev bin û ji hev hez bikin.

Wekî ku tê zanîn, pirtûkên kurdî ji çapêta belavkirinê, rastî gelek dijwariya tên. Qîrîna te bi çi awayî derket..?

□ Dijwariyên mezin, ne derxistina pirtûkê ye. Çimkî ew dijwarî eşkere ne û nivîskar xwe jê re amade dike. Dijwarî û dilêşîya mezin, nexwendina wê ye.

Nûjenî vejîna pêşerojên nenas e, vekirina asoyên bêsînor e, dîroka azadiya peyvê ye, elfabeyê nuh e. Li gorî qonaxa ku toreya cihanî di nûjeniyê de gihîştîye wê, toreya kurdî di gavên destpêkê de bi lez dilive û hêviyên mezin di pêşerojê de, li ser pêşketina toreya kurdî û nûjeniya wê, dide.

ANAKA NEZİR PALO

- ✓ Di sala 1960'î de , di rojêke bi mij de, di hêlîna çiyakî Efrînê de, ji dayikê bû.
- ✓ Ji 1972'an vir ve li Helebê dijî.
- ✓ Di 1984'an de, ji Zanîngeha Helebê, fênameya çandîniyê stand.
- ✓ Endamê Koma Armanc ya muzîk û stranê ye.
- ✓ Endamê Koma Xanî ya Çand û Wêjeyê ya Kurdî ye.
- ✓ Di 1997'an de, berhevokek bi navê Qîrîn çap kir.

Pirtûka kurdî, bûye xwarina mişkan. Xuya ye gelê me ji pirtûka xwe direve û zimanê xwe ji bîr dike û xwe davêje windabûn û sojandinê. Û bivetiyê vê yekê, ne ji birakujiyê kêmtir e.

Dema ku yek, helbestên berhevoka Qîrîn dixwîne, dibêje qey nivîskarê wan ne yek e, ji ber ku helbest in tê de bilind in, wekî helbesta Tizbî. Hin jî bi awayekî normal hatine nivîsandin...? Çima?

□ Eger tu li kîjan berhevoka helbestê vegeerî, bi çi zimanî be jî, tu yê wî tiştî tê de bibînî. Gelek caran, tu helbestên nivîskarekî bi nav û deng dixwînî, dîsa ji tu digihêji wê nêrinê. Lê dîsa jî, ez xwe sûcdar dibînim, di ber vê yekê de û pêwîst e ku min hilbijartin ji helbestên xwe re, çêbikira berî ku min bidana çapê.

Her nivîskarek dikeve bin akama (hîkariya) nivîskarîne mezin, bêtir akama kê li ser te hebû?

□ Divê nivîskar her zanyarî bixwîne, xwe di warê felsefe, raman, dîrok, evsan, wêje, çand, raman û ferhenga zimên de xurt bike. Her wiha jî divê ew her tim zanebûna xwe kûr bike û rewşên birîya xwe bilind bike. Divê her nivîskarî/e bixwîne, lê xwe di bin akama kesî de nehêle. Şeweyekî taybet ji xwe re ava bike. Wiha jî, ez dikarim bibêjim, ez azad û serbixwe me.

Wekî ku tê zanîn tu yek ji endamên Koma Xanî ya çand û wêjeyê ya kurdî yî.

Çi çalakiyên ve komê hene...? Û rola wê di pêşxistina toreya kurdî de çi ye?

□ Tevî pîrbûna astengiyên, Koma Xanî bi hin çalakiyan radibe, wekî; li-darxistina şevbuhêrkên helbest û kurteçirokan. Û hin şevbuhêrkên ji bo nixandina weşanên nuh re ava dike. Her sal pêşbazîya kurteçirokan li dar dixê. Livandina babetine pêwîst di warê ziman û çand û wêje de. Bi vê yekê, rola wê di pêşxistina toreya kurdî de, hin bi hin, wê diyar bibe.

Helbesta kurdî li Başûrê Biçûk heta niha, xweşik ava nebûye, dengê xurt bilind nebûye.? Di nêrîna we de pêşeroja helbesta kurdî, li vir wê çawa be?

□ Tevî nîrên (şert) taybet, li Başûrê Biçûk ji ber nehînbûna xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî û tunebûna dibistan û çapxaneyên kurdî û gelek tişt û astengiyên din, navine hêja bilind bûn û dengê wan li der û hundirê Kurdistanê belav bû, wekî; Cegerxwîn, Tirêj.... û pir hene ku bi wî şeweyî dinivîsîn, ev di warê helbesta klasîk û di warê helbesta nûjen de, livek bi lez û hêz tê kirin û hin nav xwe diyar dikin. Wekî; Ehmed Huseynî, Rûxweşê Zîvar, Jan Dost, Diya Ciwan, Tengezarê Marînî, Awaz Kalo û pir nav û dengên din, wê pêşeroja helbesta nûjen vebirûsîn.

Xuya ye tu bi şeweyekî nûjen dinivîsînî, gelo tu nûjeniyê çawa dinirxîne û di toreya kurdî de nûjenî, gihîştîye kîjan pelanê angî derece ye ?

□ Nûjenî cirêdeke vekirî ye di her tiştî de. Firîn û melevanî ye di heyamên bêdawî yê berdayî de. Nûjenî lêgerînek bêbend e, di kûranyê û paş sînoran de, nigarkirina xewn û hêviyên azad e. Nûjenî vejîna pêşerojên nenas e, vekirina asoyên bêsînor e, dîroka azadiya peyvê ye, elfabeyê nuh e, ji gerdişî û wekhevîyê bi dût dikeve, jinişkavebûnek wêne û raman û zimên e, peydabûna muzîk û meqamine serbest e.

Li gorî qonaxa ku toreya cihanî di

Palo û Qîrîna wî yek e ji helbestvan

Ji Nezîr Palo çend helbest

Banga dawî

Her demekê
Çoristanek di çavên me de
şiyar dibe...
Û çemekî xwînê
di nivê eniya me de
bi der dibe...

Welat jî...
Rengên mirinê...dihêjme-
re
Û rengê xwînê jî nav wan
bi ser xwe de dike
û vedixwe...

Wayê... lê wayê
Em ketine çî tayê
Li şeva bi dawî nayê

û piştî wê pêşî...
û goşeyên risabûnê
Li ser sîngê bîkan
vedabûnê...

Wayê... lê wayê
Êdî deng ji min navê
Êdî deng ji min navê

Di devê Zerdeştê...
Zendevêsta lal bûye...
Ka dê werin
em çî jî di hîna re bûlîlîn
Em sereşî xwe bi kî jîl-
peserîn

Emê çî bêderê
Li pêş Şêx Seîd û Qadî li
ba kin
Emê çî gerdenî
Di stûyê Zilanê û Leylê
kin
Emê çî destanê
Ji Xanî û Cegerxwîn re
ava kin
Emê çî dermanî
Li birîna Helebçe û Me-
habad kin

Wayê... lê wayê
Çima roya me hilnayê
Çima şev bi dawî nayê
Wayê... lê wayê
Êdî deng ji min nayê.

Dengvedan...

Her ku
bi zarokên xwe
şa dibim
û bi wan re
dilîzim...

Dengvedana kenê
zarokên Helebçe
ji nuh ve
di guhê min de
vedije...
û ji nişka ve
şabûna min
sar dibe...
û listin
ditevize...

Tizbî

Kalemêrekî
Jiyana xwe di tizbiyekê de
daye hev...!
Kalemêr
her rojê
sed carî teneyên tizbiyê
bi ser hev werdike...
û bûyerên dîroka xwe bîn
dike....!

Hin tene wî şa dikin
û hin tene birînên wî
vedikin....!
Carina ...
bi ciwaniya xwe re mijûl
dibe
û di çavê dîlberan de
evîna xwe dibîne....!
û carina
bi ser hêviyên vemirtî de
dinale....!
û bi her tenakê re keserekê
dikşîne...!

nûjeniyê de gihîştîyê, toreya kurdî di gavên
destpêkê de bi lez dilive û hêviyên mezin di
pêşerojê de, li ser pêşketina toreya kurdî û nû-
jeniya wê hene.

Rexneya helbesta kurdî di çî warî de ye...? Û
rexnegirê kurd çî rolê dilîze...?

□ Tenê ez dikarim bibêjim, ne rexne û ne
jî renxegirê kurd heye. Carina û pir kêr jî, hin
pesin, yan jî rîsa û êrîşkirin, di hin rojname û
kovarên kurdî de tîn weşandin. Ev tişt ne du-
rist e û alîkariyê nake. Çimkî berî her tiştî, di-
vê armanca rexneyê, pêşxistina helbestê be, ne
pesin yan jî birîndarkirina helbestvan be. Ta ku
mirov bikaribe, bi vê karî rabe û bi rexnegir
be, divê zanebûna xwe pir bilind û fireh bike,
di her warî de û bi taybetî di çand û wêjeyê de
û ji helbestvan zanetir be. Divê ew karibe
bihevixistin û binyatkirina helbestê û çawabû-
na avahiyên wê, xweş ji hev cuda bike.

Dîsa pêwîst e ew rexnegir karibe, taybetiya
her helbestekê nas bike û di heyama wê de bi-
jî, xwe bigihîne wê û sembolên wê, rîtm û
hermoniya peyvê bipelîne. Berî her tiştî jî,
divê ew xwe di ferhenga zimên de xurt bike,
bilind û nizimbûna her helbestekê zelal bike.
Wiha mirov dikare bibe rexnegir û bi duristî
rexneya helbestê bike û rola xwe baş di pêşxis-
tina helbestê de bilîze.

HEVPEYVÎN: JANA SEYDA

Di nimêjan de
Em navên xwe
Ji bîr dikin
û rojhilat...

Di bin neynûkên pêxembe-
ran de
Stûyê xwe xwar dike
û bêhna me
xwe penaberî rûkeniya
berfê dike

wayê... lê wayê
Can û hişê min nemaye
Em ketine çî belayê

Li ber delavê gewdê xew-
nek berbûrî
Bang û qîrîna me
Kûrkê dikşînin...
Li ser çaterêkan
Bêjiyan...
Cilên evîne jêdikin

Romana Mahabadê: "Pêşmerge"

Romannivîsê kurd, Mehmet Uzun, di gotûbêjekê li ser romana kurdî de qala sersariya kurdan a ji bo kesayetiyên kurd kiribû û wiha gotibû: "Kurd digel ku mêjûya jidayikbûn û mirina Che Guevera gelekî baş dizanin, lê haya wan ji gelek kesayetiyên kurd yê têkoşer û stembar nîn e." Bêguman ev sersarî ne tenê girêdayî sînorên fizîkî ye, bêhtir girêdayî nepelişandina sînorên psikolojîk e. Îro jî rojeva xwendayên Bakur zêdetir girêdayî rojeva çepgirên tirk e û li ser diroka perçeyên din ên Kurdistanê xwedî agahiyên sereser in.

Piştî mirov romana Rehîmê Qazî "Pêşmerge" û jînenigeriya wî dixwîne, ev yek bêhtir xwe dide der. Balkêş e, Qazî jî romana xwe di sala 1958'an de li biyanîstanê, li Bakûyê bi kurdî (zaravayê soranî) lê kiriye. Ev pirtûk ji aliyê Weşanxaneya Nûdemê ve li Swêde hate weşandin. Ziya Avcî jî pirtûk li kurmancî aniyê. Tevna pirtûkê li ser pêvajoya damezrandina komara Mahabadê hatiye honandin. Di pirtûkê de nakokiyên çinayeti digel çewsandina axayan a li ser gundiyan tê vegotin. Dîsa xebatên ramyarî yê Komeley Jiyanevey Kurdistan tevî evîna Pîrût û Mîrût tê zimên.

Der barê çapa yekem a pirtûkê de agahiyên cur bi cur hene. Lê bi pey agahiyên Rehîmê Qazî Pêşmerge cara yekem di sala 1959'an li Erîvanê, di sala 1961'ê de li Bexdayê hatiye çapkirin û di sala 1963'an de jî li zimanê azêrî hatiye wergerandin.

Di romanê de motifên folklorîk berbiçav in

Pêwîst e, roman li gorî serdema nivîsina wê û wêjeya kurdî bê hêlengandin. Ji ber vê yekê divê li gorî wê bê xwendin. Roman ji aliyê naverokê û zimên ve tamijîner e û mirov bi germahiya wan rojan dihesîne. Lê ji ber ku kêmasiyên romanê îro jî derdikevin pêş-

berî me, pêwîst e mirov li ser raweste. Di romanê de taybetmendiya ku bala mirov dikşîne, pîrçehremanî û lawazbûna tîkiliya di navbera beşên romanê de ye. Beşa romanê a li ser evîna Pîrût û Mîrût bi serê xwe dikare bibe kurteromanek e. Di vê beşê de motifên folklor û çîrokên kurdî gelekî berbiçav in. Pîrût û Mîrût li ser kaniyê hev û din dibînin û gelek caran stran diavêjin ser hev. Li aliyê din jîna muxtar Fatê, rola pîrhevoka çîrokên kurdî bi cih tîne. Her wiha biwêj û gotinên pêşyan yê kurdan di romanê de pir û baş hatine bikaranîn.

Li aliyê din, roman di warê şewaza romannivîsê de zêde bi serketî nîn e. Nivîskar carina wekî sosyologekî qala dab û nêrîtên kurdan (keçrevandin, berdel, nêçîr û nêçîrvanî) dike, carina jî bûyerê wekî dîroknasekî vedibêje. Bi taybetî beşên li ser avabûna Komara Kurdistanê dişibin pirtûkên dersan.

Nivîskar bi taybetî di warê îdealîzekirina bûyer û qehremanan de bi se neketiye. Di hin beşên pirtûkê de îdealîzekirineke sîbjektîf heye. Bo

nimûne nivîskar taybetmendiyên Mîrût wiha vedibêje: "Lê wekî hemû keçên kurdan qet ji nemehemî û rûmeta xwe tiştek winda nekiribû." Her wiha ji bo şervaniya kurdan jî wiha dibêje. "Vêca kurd be tiving bi dest ketibe! Wey li halê dijminê wî kurdî." Dîsa di romanê de li ser kurdan Qazî Mihemmed wiha dibêje: "Azayeti û netirsî nimet Xwedê ye, ku çavkaniya wan ji koka kurdan tê û tîkelê nav şîrê dayika me bûye."

Peyva Pêşmerge kê bikaranîye?

Ji ber ku roman dokumanter e, hin agahiyên balkêş jî tê de hene. Bi taybetî beşa li ser peyva pêşmerge balkêş e. Li gorî vegotina R. Qazî, Mihemmed Qazî jî ber ku xwastiye di warê leşkerî de jî peyvên kurdî bîn bi kar anîn, lê beramberî peyva, serbaz, fedayî koma zimanzan û şarezayan peyveke nabînin. Peyre xizmetkarê civînê tîkîlî civînê dibe û dibêje: "Kalîkên me ji bo mîrxas û netirsan digotin pêşmerge". Li ser vê yekê peyva pêşmerge tê bikaranîn.

Dîsa wekî xaleke balkêş, her çiqas Komeleye Jiyanevey Kurdistan wê demê nêzikî Yekîtiya Sovyetê bû jî, endamên wê li ser Quranê sond dixwin. Her wiha ji bo gundî û hejaran peyva kurmancî tê bikaranîn.

Rewşa zimanê kurdî ya berî avabûna Komara Kurdistanê jî di romanê de diyar dibe. Pêşmerge başbaş kurdiya rêveber û fermanî fêmanî û ecêb dimînin.

Li ser lêanîna ji soranî jî bo kurmancî, tiştê ku bala mirov dikşîne beramberî gelek peyvên kurdî yê ku-pir tîkîlî bikaranîn, peyvên biyanî hatine bi kar anîn. Bo nimûne: "Xeyrî ihtiyarî, esna, mexsus, diqet kişandin, mûddet, îstîrahet kirin." Her wekî gelek weşanan di şûna "nava min û nava dilê min" de peyva "hundir" hatiye bikaranîn

MAZLUM DOĞAN

REHÎMÊ QAZÎ




Jiyana Rehîmê Qazî, yekser jiyana Celadet Bedirxan û Mehduh Selîm Begtîne bîra mirov. Ji ber tesîra romanên li ser jiyana wan, mirov bêhtir li ser jiyana û serpêhatiyên Rehîmê Qazî hûr dibe.

Rehîmê Qazî, di sala 1925'an de li rojhilatê Kurdistanê li navçeya Mukriyanê jî dayik bûye. Ew, pismamê Qazî Mihemmed e. Qazî, gava 17 saliyê dibê endamê 'Komeley Jiyanevey Kurdistan' û piştî xebatên xwe yê siyasi di nav PDK-Î didomîne. Wî, serdema damezrandina Komara Kurdistanê tîra xwe jiyaye. Piştî ku Komara Kurdistanê tîra damezrandin, li dora 60-70 kes, ji bo xwendin û perwerdekirina kadroyan diçin Bakûyê. Rehîmê Qazî jî di nav kesian de cih girtiye. Lê, piştî çûyina wî pênc-şeş mehan, Komara Kurdistanê dipelişe. Li ser vê yekê her çiqas gelek hevalên Qazî, vedigerin Kurdistanê ew û çend hevalên wî li Bakûyê dimînin. Peyre ew dest bi xwendina akademîk dike û di sala 1945'an de teza xwe ya li ser tevgera neteweyî ya kurd amade dike. Di vê navberê de dewleta Îranê jî bo wî cezayê îdamê derdike.

Dema Mele Mustafa Barzanî diçe Sovyetê, Rehîmê Qazî li gel wî peywendiyên datîne û bi hev re ji bo ku serokatîyekê nû li Kurdistanê bê avakirin, tê dikoşin. Her çiqas ew hewlîdana wan digihêje serî jî, zêde nadome. Lê, Qazî digel hevalên xwe xebatên xwe didomîne û li Bakûyê rojnameyekê yekrûpel û radyoyeke ku bi kurdî weşanê dike, saz dikin. Rojname bi qasî 13-14 salan tê belavkirin.

Rehîmê Qazî, piştî ku li Îranê şoreşa Îslamî pêk tê, vedigere Kurdistanê û dibê endamê Komîteya Navendî yê PDK-Îranê. Lê di sala 1981-1982'an de digel beşek hevalên xwe alîgiriya "Kongreya Çaremîn" dike û ji PDK-Î vediqete.

Wî ji bilî romana "Pêşmerge" bi navê Mihakemeya Qazî Mihemmed û Teverga Rizgarîxwaz a gelê kurd du pirtûk nivîsîne. Lê, pirtûka dawî nehatiye çapkirin. Rehîmê Qazî, ji ber nexweşiya apandîsê di gulana 1991'ê de li Bakûyê çû ser dilovaniya xwe. Hesen Qazî, di jînenigeriya wî ya ku ji bo "Antolojiya Edebiyata kurdî-M. Uzun" nivîsiye de ji bo wî wiha dibêje: "Ew însanekî dilpak û xweşmeclîs bû. Ew kurdên ku wî jî nêzik ve dinasin, dizanin ku wî her dem xwestiye xizmetê xelkê xwe bikê."



Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 28.02.1998 Şemf:

Teatra Jîyanan Nu "Komara Dînan" 'Şermola'

Saet:14.00

Beksav Konser "koma Koma muzîkê ya yenîgûn"

Saet:17.30

● 01.03 1998 Yekşem: Konser "Koma Azad"

Saet:14.00

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya Îzmîrê

● 28.02.1998 Şemf: Roja xwarinên kurd ên kevneşopî ya 19'an

Saet:18.00

Konsera Koma Tofan "Sûra Welatî". Koma Tofan di sala 1997'an de li şaxa NÇM'ê ya Îzmîrê ava bûye. Bi piranî muzîka otantik çêdike û bi zaravayê dimilkî berhemên xwe pêşkeş dike. Kom ji pênc kesan pêk tê. Amûrên wekî Bağlama, gîtar, Filût, ork û amûrên rêtmê bi kar tînin. Xebatên xwe li NÇM'ya Îzmîrê didomînin.

Ji devê rovî çîroka şêr:

Boksor

Di film de polîsên îngilîz sol û kincan didin zarokan, lê rêxistina ÎRA'yê li mafyaya îtalî hatiye şibandin.

Bi serî îşaretê didin hevdu û kî li ku derê kê di kuje ne diyar e. Ev tiştêkî seyr û ecêb e. Lewre wekî tê zanîn ÎRA rêxistineke şareza ye û berî ku cihekî bombe bike polîsên îngî liz agahdar dike.



V an demên dawîn gelek film li ser rêxistina ÎRA'yê tînin çêkirin. Gelo ev film bi rastî ji bo nîşandana rastiya rêxistina ÎRA û rastiya jiyana gelê Îrlandayê an jî li dûv daxwazên pergala Îngilîstanê tînin çêkirin? Temaşevanekî/e ku zanabûna wê/wî ya siyasî zêde ne xurt e jî dikare tê derxe ku ew filmên wekî "Çakal", "Îtirafkar" û îcar jî "Boksor" ji bo çi tînin çêkirin.

Filmê Boksor, bi dimenê militanekî kevn ê ÎRA'yê ku ji girtûgehê derdikeve, dest pê dike. Lê mixabin heta dawîya film jî mirov pê nîzane ka ji bo çi ew ketiye girtûgehê û çima 14 salan bi serê xwe maye bêyî ku bi kesî re bide bistîne. Piştî ku Danny Flynn (Daniel Cecil Day-Lewis) ji girtûgehê derdikeve rastî antrenorê xwe yê berê tê û dîsa jiyana xwe yê berê ya boksoriyê didomîne. Tiştê balkêş ew e ku, antrenorê wî jî, ji ÎRA dîr ketiye û çêran li ÎRA'yê dibarîne. Qaşo militanê kevn Danny Flynn kesek aşîxwaz e û gava rêxistina ÎRA'yê di nava bajêr de livbaziyekê pêk tîne, Flynn li ser vê yekê xemgîn dibe û dibêje: "Xwedê wan nehêle dîsa bombe! Wê dîsa bi dehan kesên bêguneh bimirin." Li aliyê din, di film de polîsên îngilîz sol û kincan li zarokan belav dikin, lê endamên ÎRA'yê wekî endamên rêxistinên tawankar tînin raberkirin. Rêxistina ÎRA'yê bi tevayî li mafyaya Îtalî hatiye şibandin. Bi serî îşaretê didin hevdu û kî li ku derê kê di kuje ne diyar e. Ev tiştêkî seyr û ecêb e. Lewre wekî tê zanîn ÎRA rêxistineke şareza ye û berî ku cihekî bombe bike polîsên

îngilîz agahdar dike. Ev helwesta derhêner, dide xuyakirin ku film ji bo berjewendiyên kê hatiye kişandin.

Derhêner Jim Sheriden piştî filmên "Nigê minê Çepê" û "Ji bo bavê min" bi vî filmê xwe derket pêşberî temaşevanan. Her çiqas mijara film wekî tê gotin li ser serpêhatiya kesekî (Barry Mc Guigan) hatibe honandin jî, wekî me li jor qalê kir jî rastiye dîr e.


Wekî her gav em dikarin bibêjin di filmên ewrûpiyan de deng pir baş tê bikaranîn. Û bi vê re muzîk jî dîsa baş tê bikaranîn. Ji hêla listîkvaniyê ve jî her çiqas dirûvê Danny Flynn her dem paqij e û ne wekî boksoran xuya dike jî rola xwe baş bi cih tîne.

Di dawîya dawî em dikarin wê bibêjin; gava Vietnam di bin destê Amerîqayê de bû, derhêner û listîkvanên amerîkî çawa dixwestin, li gorî dilê xwe filmên ji rastiye dîr der heqê şerê Vietnam û Amerîkeyê de bidin çêdikin. Û em wan filma hîn jî dibînin, ka çawa bi derew û ji rastiye dîr hatine çêkirin. Dema gelê Vietnamê azad bû, sînema wan jî azad bû. Wan filmê xwe çêkirin, li ser rastiye û bi şoreşgerî. Ev jî bo hemû gelên cîhanê derbas dibe. Ji bo ÎRA'yê û ji bo me jî!

ŞEXMÛS ÖNAL

TÎŞK

Peyniye de Amerîka Qesa xo berde sere



KAZIM TEMURLENK

H emilkan eke sistemê sosyalîzmî bi vîla, politikawo de bin kerde virendiya xo. Ebe na politîka wazeno ke dinya pêro bizero binê bandira xo. Raver sosyalîzm ci rê mane bi nişkiyene rêt bi lewiyo. Politîka xo sosyalîzm gore virastene. Wertê rojhilat de çî ver va sosyalîzm paşt dene taye dûgel o. İran, Tirkîye, Îsraîl ebe paştâ împeryalîzm bi dûgelê koledarî û gonewerî. Wexto ke Îran de şoreş bi, mavenê îraniyo Amerîka bi ya. Na dem de mavenê Iraq yo Îran de ke ceng vejîya Amerîka nafa çî paşt de Iraq. Iraq verda be Îran, hergu baved çeko ra kerd mird.

Nika niyadame ke Amerîka ama vana destê Iraq de çekê kimyewî estê. Vajime ke estê, ma îson ra pers nêkenê nê çekî kamî day Iraq. Wexto ke Iraq be Iran ra dave pêro nî hacetê çekan, ya jî çekî, Amerîka, Almanya, Fransa dayî ci. Pêro dinya zanena çekê girşî, yakî bazarê çekan dest dugelanê girso dero. Çitur ke çiyê werdişî, çiyê piraguretene sero mavenê dugelan de bazarî bare biyê. Bazarê çekan jî, dugelane girso mavenê xo de bare kerde. Ma pero zaneme ke bombey raver destê Amerîka, Îngilîstan zey nê dugelanê girsode estê. Amerîka ya jî Îngilîstan sayî ke pêro pak e, sûc erzene Iraq ser. Dema ke mesela bombey niyê. Bine na heresan de menfaat esto. Sovyetî axme bi dûgele Qafqasya hona tayê ca xoserye, xelê maden, petrol, qazê binê herdî estê. Petrol axwa rojhilatî sero çî pilane newî estê. Îşte çî ke esto, bine na qesas de esto. Çiqa ke sovyetî bi letey jî Rusya hona zaf qewetin a. Yanî rihet rihet rayê nêdana Amerîka. Hergû roz dugelana Kafkasya de newî newî peymanan mor kena. Amerîka xo be xo wena, hama neşkina virendiya Rusya bizero. Amerîka werte rojhilat de en zaf gumane xo pêTirkîye û Îsraîl ana. Hama nê hurdimina jî wertê rojhilat de tek mendê. Raya Qafqasya serba Amerîka wertê rojhilat ra dûgel jî Amerîka de hast niyê. Amerîka hete ra ebe dîplo-masî, hete ra jî ebe zor wazena ke nê dugelan bizero binê bandira xo.

1991 de xora ke Amerîka Iraq ze waiena xo biyardenê raye, nika belka sira amey bî Îran. Hama 1991 de ze vatena Amerîka nêbi, heta însan siçîno (şeno) vazo, verva Saddamî Amerîka gama peyser est. Dugelane Ewrûpa no xo rê firsend dî, ambargowo ke nayibi Îran, Iraq ser lone kerd. Ewrûpa ebe naye mesajê da Amerîka. Ewrûpa jî bare dima bi.

Yanê mesela bombey niye. Mesela petrol, axwe, qaze bine herd yo. Wexto ke Halepçe de ponc hazar însan qir bî, nê dûgelê gonewerî kotî bî. Wexto ke 182 hezarî millet enfal de kerd vinî nê dugelî kotî bî. Saddam nobedarîna Amerîka nêkeno. Saddam ke jûye kerda, Amerîka des kerde. Saddamî mileto kirmanc qir kerd, Amerîka Vietnam ra bize hata Kûba neçe millet sero qirim kerd. Afrika vesaniye ra qir bena. Na Amerîka Awrûpa kotî ya. Hergu kes zaneno ke çekê de destê Afrikayizan de ver ve jûbin danê pero, kul Amerîka û dûgelanê binan ra ceriyê. Tûrkiye hande bombey qazinî eşî gerilawo ser, Amerîkanij yakî Îngilîz jî nêzanenê

Çapameniya dinya çend rojî yo ke Saddam sero cengo de psikolojik naybi ro. Peyniye de Saddamî taye çî qebûl kerdî. Hama Amerîka nayê ra dima onca, onca wazena. Çi ke Amerîka rê petrol, qazê binê herdî lazimo. Amerîka îta ters dano Ewrûpa re jî vano: "Handê orxanê xo nînganê xo derg ke."

Bazara birayê xayîn

Demek hebû du bira
Her du rabûn li wira
Tev de kolan erd û ax
Bo lêkin qesr û qonax
Bawerî bi hevdu anîn
Bo xanî bingeh danîn
Nerm kirin kils û herî
Kevir anîn ber derî
Tev xebitîn jin û mêr
Ji xeynî ewê bêxêr
Mîna gayekî zexel
Wî çav berdabû mexel
Bêdengî li hemdê wî bû
Xebat ne karê wî bû
Tim rûniştî ew li per
Rojekê kes neçû ser
Gotin nehat guhê wî
Xira nebû cihê wî
Kesekî negot "bira!"
Carekê were vira
Çir tu nayê civatê
Nakevî nav xebatê?
Carek çî ye wî bi xwe
Nexist xanî keda xwe
Mirov mîna morîstan
Dixebitîn bêwestan
Hin bêr hildan hin bivir
Kişandin ax û kevîr
Bo ku zû lêkin xanî
Hina ji wan av anî
Dest pê kirin ji serî
Bi kevîrên şehkirî
Zêç û zarok bi tevayî
Bilind kirin avayî
Pir xebitîn meh û sal
Êdî bûbûn xwedî mal
Li wan neman dest û pî
lê kirin qesrên spî
Derî, pacê li ber xistin
tey û erdî raxistin
Rûnişt birayê karker
Yek hat rawest çik li ber
Got: "Ez birayê te me
Şirikê malê te me
Xaniyê min û te ye
Jor ê min jêr ê te ye
Bêdestûr çû ber xanî
Navê xwe li ser danî
Dû re got: "Li ser derî
Yê min e navê serî
Ez im birayê mezin
Ger li xwe kî navê min
Birazê karker got: "Çima?"
Tu li xanî bûy tîma
Berî em lêkin xanî
Min bawerî bi te anî
Ez xebitîm hîn bêtir
Min anî ax û kevîr
Xanî lêbû li vira
Tu li ku bûy ey bira!?
Xebat diçû zora te
Îro mal hat bira te
Xanî hemû keda min
Te jê tiştê neda min
Tev de xanî min çêkir
Te hat navê xwe lê kir
Qey nabîne çavê min
Ka li ku ye navê min
Wekî malê bavê xwe
Te li ser danî navê xwe
Bo wê heye çî sedem?
Wilo dikî tu her dem
Ger dixwazî biratî
Nexe dilan şewatî
Ger dixwazî wekhevî
Mal parê ke bi nêvî
Xanî yê min û te tev
Her du nava deyn ber hev
Birazê fenok û xayîn
Dike bibe har û dîn

Got: "Çavê xwe veke binêr"
Tev ê min in jor û jêr
Ez im xwediyê xaniyê nû
Tu derkeve here zû
Bo çî tu li vir rûniştî
Ez im xwediyê her tiştî
Lê tiştêkî din heye
Bazara min û te ye
Peyman deynim bi te re
Guh bide min ji xwe re
"Tu car ji min negire rik
Bixebite bi nanê zik
Ezê rûnim li malê
Tu bîne qûtê salê
Razim li ser textê zêr
Tu dakeve qatê jêr
Ezê bixwim goştê kar
Hestî ji te r' bikin par
Genim yê min, ceh ê te
Du par ê min yek ê te
Ezê rûnim li eywanan
Tu em bike heywanan
Ez bibim siwarê hespê
Tu bimeşe tim li pê
Têkevim kêfa dinê
Tu jî çêke xwarinê
Tim bigerim hawîrdor
Tu paqij ke jêr û jor
Ezê bibim sermiyan
Tu bike karê piyan
Nadime te avayî
Te re bêjim bi kinayî
Ez axa û tu xulam
Bazar ev e ey zilam!
Tiştê ku bêjim ev e
Tu naxwazî derkeve
Çend sal borîn bi wî rengî
Birazê karker kir dengî
Rabû ser xwe jê re got:
Êdî nema diçim cot
Ne xulam, ne axatî
Ez dixwazim biratî
Ev çend sal e, kole me
Li bû birayê te me?
Ez dizanim çilo ye
Biratî ne wilo ye
Bira bira nakuje
Û xwîna wî namije
Min pir kişand ji wî destî
Ez mame çerm û hestî
Tu mirovekî bêbext î
Wek mirina bêxwext î
Bo ku dilê te reş e
Ev biratî nameşe
Birazê xayîn bersiv da
Zêde lingê xwe rada
Bi ser ve bû gote wî
Xwediyê xanî ne tu wî
Mal daye min bavê min
Ku çî hebe yê min e
Qet para te tê tune
An xulam bî yan xulam
Nexwînin e bo te tam
Mal û zevî rez û pez
Lewre xwedî ez im ez!
Birazê karker got: Naxêr!
Ez ji te bûme zivêr
Ez dibêjim wekhevî

Tu ji vê yekê direvî
Ez dibêjim biratî
Bo vê tu nakî tebatî
Li min dikî çavsorî
Naqede zilm û zorî
Bo xwe mal milk dixwazî
Bo min jî belengazî
Tu tev nerm û pişt hişk î
Mîna mar û dûvpîşkî
Xwe pir vir de û wir de didî
Bêdeng bi min vedidî
Wilo nabe li cem hev
Jiyan heram bûye tev
Li vir nema biratî
Bes e êdî kolefî!
Cihê bibim ez bi xwe
Bo jiyanek serbixwe
Xanî nêvî yê min e
Cihê bûn mafê min e
Ezê ji te cihê bim
Nexwe cihê ku lê bim
Birazê xayîn rawest
Per û baskên wî şikest
Bû zingzinga dirana
Gazî kire cîrana
Bi qîrîn û bi hawar
Rabû kire barebar
Got: "Binêrin li vira
Şer derdixê ev bira
Tev de bibînin ji xwe re
Mêrik ji min nagere
Ew dibêje cihêbûn
Safî bikin êdî hûn
Wekî hûn jî dibînin
Ez û wî tev de dijîn
Ma qey em ne bira ne?
Va hûn jî li vira ne
Çî tada min bûye lê
Tew yê min e cihê lê
Cîran hatin ferca wan
Pir kone bûn hin ji wan
Hin li nal dan, hin li bizmar
Gotin: "Çî ye ev bazar?
Em nizanin derdê we
safî bikin hûn bi xwe
Lê belê hinek cîran
Rind axivîn ji bo wan
Kirin qisên gelek xweş
Derket holê rûyê reş
Gotin: "Em jî dizanin
Xuya ye hûn biran in
Ê we yek e bav û dê
Em dibêjin bo Xwedê
Ger bê gotin bi rastî
Li vir heya zordestî
Hûn yek axa yek xulam
Pir nexweş e ev meqam
Ger hûn divên biratî
Bila rabe axatî
Ew deng çû birê xayîn
Ji nû ve bû har û dîn
Got hûn hemû dijmin in
Hevkarên birayê dîn in
We şer xist mabêna me
Bo hûn werin şûna me
Mal yek e, nabe du par
Yê min in ev cih û war
Bila qet neke hêvî

Ez mal nakim bi nêvî
Ez û wî birayê hev in
Hûn ji nav me derkevin
Hûn cîran tev de neyar in
Pir xayîn û hevkar in
Dinya li min bû dijmin
Kesek nema dostê min
Hûn xwe nedin dora wî
Ezê bînim qira wî
Birazê karker got: "Bira
Guhê xwe bide vira
Îro ku ez nebûma
Dê xanî tune bûna
Keda min e ev xanî
Vê yekê baş dizanî
Tim li şer e berê te
Gotin naçe serê te
Dibêjim "Ez mirov im"
Ne giya me, ne hov im
Va hene zarokên min
Wargehê bavê me ye
Rûniştin mafê me ye
Ez dibêjim vê gavê
Min tu carî şer navê
Aştî bawer e bi vê yekê
Aştî nabe bêyî çekê
Ger tu mêrî derkeve der
Ez dibêjim şer û şer
Gava qala şer dike
Birazê xayîn deng dike
Dibe: "Hay ho! Ev kî ye?
Îca şer ji bo çî ye?
Bi gaz in û bi awaz
Got: Tu bûyî cudaxwaz
Pişt re bang kir gundiyan
Gote: Rabin ser piyan
Ev birayê bi teşqela
Li serê min bû bela
Gundiyan got: Neke deng
Dinya li te bûye teng
Kesek nîn e ker û gêj
Te xwest serê bi qirêj
Te dest da ser malê wî
Milkê bav û kalê wî
Ka li ku ye hişê te
Li vir çî ye pêşê te?
Karê te ye bêmafî
Zilm û zor û bêbavî
Birazê xayîn nekîr der
Çû ser birayê karker
Got qet neke dengê xwe
Here rûne li cihê xwe
Ez didim te av û nan
Ez xwedî, tu natorvan
Li derdora xwe bimêz
Her gav ez im yê bi hêz
Tu hem qels, hem lawaz î
Bi ser de cudaxwaz î
Pêş de diçî tu gelek
Li te rakim çerx û felek
Êdî tu jî dizanî
Nadim te kevîrê xanî
Birazê karker xwe kar kir
Malbata xwe hişyar kir
Got: Rabin çare nema
Tev de hildin şûr û rîman
Dest dane hev wan li wir
Dê û dot û bav û kur
Tev şer kirin bi rastî
Hilweşandin zordestî
Xanî xistin destê xwe
Mizgîn dane dostê xwe
Ji holê rabû ew xayîn
Êdî nema şer û şîn
Karker li xanî rûnişt
Cihan jê re bû bihuşt
Dawiya xayînan ev e
Dê rastî bi ser keve.

Nimûneyeke karê kesane:

Kovara Helwest

Piştî cuntaya faşîst, bi hezaran mirovên siyasî derketin derveyî welêt. Kurdên ku çûn li Swêdê bi cih bûn, ji rewşa guncaw a wî welatî sîd wergirtin û dest bi xebatên rewşenbîrî kirin. Kesên ku li welêt bi zimanê tirkî xebatên xwe siyasî dikirin, dest bi xebata li ser ziman û çanda xwe kirin. Wekî encama vê xebatê, birek nivîskar derketin holê. Wan nivîskaran jî hinek kovar û rojname derxistin, hê jî derdixin.

Di vê xebatê de aliyekî erênî, aliyek jî neyînî heye; vê xebatê ji bo geşedana ziman û çanda kurdî bingehek ava kir û ji kurdan re jî bû mînaqêke baş. Lê kesên ku ew xebat dimeşandin, bi piranî ji rêxistinên xwe dîr ketibûn, hemû bûbûn 'rewşenbîrên serbixwe,' xebata xwe bi serê xwe dimeşandin û hê jî gelek ji wan karê xwe wisa didomînin.

Kesên navborî jî rêxistinên siyasî dîr ketin, lewre jî tiştekî surîştî ye ku ew ji xebatên siyasî hinekî dîr bikevin. Lê tu rêxistinên rewşenbîrî jî nexistin dewsa van rêxistinên siyasî û al û dirûşmeya serbixwebûnê berz kir. Her yek ji wan wekî berpirsê rêxistînekê tevgeriya, lewre jî her yekî weşaneyek derxist. Gelek ji wan berhemana temenkurt bûn, piştî demekê weşana xwe rawestandî, ên heyî jî êdî zêde hêviyê nadin tu kesî. Gelek rewşenbîrên dilsoz ên ku li Swêdê dijîn jî êdî vê rastiye di-selmînin. Nivîsa mamoste Mîrhem Yiğit a vê hefteyê jî, vê rastiye bi awayekî gelekî xweş tîne zimên.

Nimûneyeke ku dîtinên Mîrhem Yi-

ğit diselmîne jî, niha li ber destê me ye. Ev nimûne kovara Helwest e. Dema mirov bala xwe baş di-

de kovare, ew gotina pêşiya tê bira mirov; "Navêkî giran, wêrekî wêran". Sernavên gelek nivîsan û naverokan li hev nakin. Kovar tijî kem a s i y ê n rastnivîsî û rêzimanî ye. Hê di pêşeka kovare diyar dibe ku haya berpirsê kovare jî gelek rêz û rêçikên rastnivîsî û rêzimanî nîn e. Bo nimûne ew dibêje: "...vê karê bi zirar...", yekî ku haya wî ji rêziman hebe, tu carî hevokê wîha saz nake, lewre rengdêra şanîdanî "kar"

mê, veqetandeka wê nêr e. Her wisa jî ji nivîsa wî bedbînî difûre: "Bazara we-

şanên kurdî qels e, weşanên xwerû bi Kurdî gelek hindik tene firotin. Yên ku weşanên Kurdî derdixin hemû jî zirarê dikin, lê ji ber vatênîya welatperweriyê vê karê bi zirarê wek xizmetek dipejirînin û weşanvaniya Kurdî didomînin."

Li hemberî van gotinan bivê nevwê çend pirsên tîne mirov; gelo heke li cihekî wekî Swêdê ew kovar zirarê dike, jixwe kovar nagihêje welêt jî, nexwe ji bo çi derdikeve? Heke nivîskarê kovare, piştgiriye bidin saziyên neteweyî wê baştir nebe? Qet nebe ew nikarin hêza xwe bikin yek û kovareke


xweşiktir derxin? Lê mixabin ew yek pêk nayê, ji ber ku kesên ku di van kovaran de dinivîsîn bi piranî li dijî rêxistinên in. Nivîsa ku ji aliyê Laleş Qaso ve hatiye nivîsîn ve helwestê diyar dike. Nivîskar qala berxwedana 1984'an dike. Lê bi çi şeweyî? Piştî hinek agahî û şîroveyan li ser rewşa Girtîgeha Amedê, gotinê tîne ser biryarên xelet ên rêveberên berxwedanê, pişt re ji nişke ve şûrê xwe disû û diajo ser komûnîzmê, bi vê yekê jî namîne dijminatîya xwe li dijî karker û kedkaran diyar dike.

Di nav rûpelên kovare de bi romani-vîs Mehmet Uzun re hevpeyvînek cih digire. Di dawîya hevpeyvînekê de pîrsek li ser kovare tê kirin û Uzun jî bersiva vê pîrsê bi pesindana kovare dide, berpirsê kovare van gotinên wî dikin spot. Gelo Mehmet Uzun di vê hevpeyvînekê tiştekî hêjayî spotê negotiye?

Hemû nivîsên di kovare de ne wekî ya Laleş Qaso ne. Li ser wêje û toreyê nivîsên baş jî hene, lê di warê redaksiyon û mîzanpajê de kovara tîkçûyî xuya dike.

Îro êdî tîkoşînê, welatê me kiriye qada vejîna çanda kurdî, li Ewropayê jî saziyên neteweyî tîne damezirandin, êdî xebatên kesane bersiva demê nadin. Rewşa kovara Helwestê jî vê rastiye diçêspîne.

SAMİ BERBANG



Sazî kulîlk in

HASAN KAYA



Mî ji devê kalekî bihîst. Gelek salan di nav rêxistinên kurd ên cihê cihê de mabû. Ev serpehatiya wî ya bîst û pênc sal berê bû:

"Rojekê li mala me civat gur bû. Nîqaşeke tund der barê "împeryalizm çî ye, faşîzm çî ye" de hebû. Tu kesî li kesî guhdarî nedikir. Zarokên malê, xwelîdanek vala dikir yeke din tijî dibû. Di wê navê de yek hebû, jê re Mele Remezan digotin. Wî jî nişkê ve got: "Hûn bi Xwedê kin, niha kîjan pîs e? Faşîzm an împeryalizm?" Her kes rawestîya. Hêjayî bersivandinê nehate dîtin. Yekî ji wan bi serê zimên got: "Apo meseleya me başbûn û pîsbûna wê nîn e." Piştî çend deqîqeyan me jê pîrsî, "Te çima gava din got ma kîjan ji wan pîs e?" Mele Remezan; "Minê bigota ji wan kîjan pîs be ev sistema ku agir bi ser me de dibarîne ew e."

Dem a mirov li qewimînên van çend rojên dawîn dinihêre, êrîşên ku çûne ser navenda HADEP'ê, girtina serokê HADEP'ê yê giştî û birêveberên din, pest û pêkutiyên li

ser NÇM'ê, mirov heyirî dihêlin. Mirov nikare navekî li vê nîzamê bike.

Ji hûrê dewletê bigire heta bi girê wê, tev wekî navê xwe dizanin ku kurdan kefenê mirinê çirandiyê? Pîrsgirêka xwe ya serokatîyê çareser kiriye. Bi ked, xwîn, xwêdan û vîna xwe gelek sazî afirandine. Ev sazî mîna wêneyê wênesazekî/ê, ristikên şairekê ne. Tu kesî jî, ew gelê kurd ew diyarî nekirine. Piştî gelek şevên reş, piştî tofanan, ev sazî derketine holê. Mirov çiqas bixwaze wan ji holê rake jî, ev yek gengaz nîn e. Ev wekî keleheke asê ne. Berf, ba û bahoz dikare tozê ji wan bibe, ew qas.

Lê tiştekî din jî heye. Heke em li van saziyan xwedî dernekevin, em di ber dilê saziyan re neçin û neyên, wekî bexçeyan naxemilînin, êdî ew tîra me nekin. Çawa ku hejmara me zêde dibe, divê hejmar û kapasîteya saziyan jî berfirehtir bibe, da ku em bikaribin tê de vehewin. Sazî ji ber xwe ve an jî tenê bi xebatkarên saziyan mezin nabin, bi pêş ve naçin. Bes, ku herkes berpirsariya hemwelatîyê bi cih bîne, bi zanatî, bi plan û program nêzikî saziyan bibe wê demê sazî xwe nûjen dikin, tîkûztir dibin. Ku em bibêjin sazî birêve diçin jixwe hewcedarî bi me nîn e. Heta ku tîkoşîn li ser piyan be, tu tişt bi saziyan jî nayê. Ev nêrîn, heta radeyekê rast e Lê çewtiyên mezin jî di nav xwe de dihewîne. Lewra barê tîkoşînê ew qasî sivik nîn e. Divê em vê mantalîteya eletewş biterikînin.

Heke em bi zanebûn ber bi HADEP'ê ve, ber bi înstîtuuya Kurdî, NÇM'ê, Azadiya Welat, Ûlkede Gündem, Gôç-Der û saziyên mîna van ve herin, bêşik ew dê bikemilînin. Na, heke em bi tenê serê çend hefteyan herin, li avahiyên wan rûn û veşerî mala xwe; çavkaniyên ku ji wan re pêwîst in negihînin ber destê wan, rexneyan li wan negirin û bi her awayî piştgiriye nedin wan, ew ê biçilmîsin.

Wê demê dewlet, wekî ku bikeve nav werzê bavê xwe, bi rehetî dê bikeve navenda HADEP'ê. Ev navend jî bo kurdan pîroz e. Hemû avahiyên saziyên me jî wiha ne. Lê mixabin her wekî ku xalê Remezan gotibû ev sîstem biwêja herî "pîs" e, ne xwediyê şermê ye, ne jî bi qasî serê derziyê wîjdan pê re heye. Ji bo ku rûmeta kurdan bin pê bike, dest diavêje saziyan û rêveberên wan.

Carinan li Hindistanê, ji bo ku leşkerên dewletê dikevîne perestgeha terîqeta Sîhan, hefteyekî şer û pevçûn ranaweste. Li gelek welatên din jî wiha ye. Bê destûr ketina perestgehan, ketina cihên pîroz ew ne qasî hêsan e.

Dibe ku were gotin, "welat azad nîn e, ji ber wê yekê destavêtina saziyan jî tiştekî normal e." Ev nêrîn ne rast e. Lewra êdî em heta bi sînorê saziyan azad in. Berhemên ku bi xwîne hatibin bidestxistin, kelehên azad in. Ji aliyê hemû cihanê ve hatine tesclîkirin. Divê em wekî çavên xwe li saziyên xwe xwedî derkevin.

Ji bo kermêşan dikişînim!

Rojek Hecî Nayifê Bolşî li mal e. Gundiyekî wî tê, dibêje:

- Hecî mêşîna te mirdar (mirar) bûye. Lê şivan nediye.

Baran jî hûr hûr dibare. Payiza paşîn e. Hecî Nayif baz dide, diçe. Mêze dike mêşin mirar bûye. Pir bi ber mêşîna xwe dikeve û dizivire tê gund. Baran jî xweş dike. Li ber diwêr di alî talde, hinek mêr ji xwe re baranê te maşe dikin. Hecî Nayif ji kerba mêşîna xwe cixareyekê ji yekî distîne. Vêdixe û her hilma ku lêdixe, wekî düyê kulekê (rojin) dî ber dide. Çendekî berê jî Hecî Nayif gotiye: "Bi mala Xwedê êdî ez cixarê nakişînim. Min dev ji cixarê berdeya." Yekî gundî dibêje:

- Hecî qey te dîsa dest bi cixarê kir?

Baran hîna jî dibare. Hecî Nayif nayine ser xwe û dibêje:

- Na weleh. Ez çawa cixarê dikişînim? Min ji bo kermêşan vexist. Kermêş pir in.

Mîne tu bikuştal

Dîsa rojekê Hecî Nayif bi gundiye- kî xwe re li hev dixê (pevdîçe). Kevir di hev wer dikin. Gundiyê wî kevirêkî mezin, diavêje wî. Hecî Nayif



xwe diavêje piştî diwêr. Kevir lê na- keve. Dike qêrîn dibêje:

- Ava bi mala Xwedê ev kevir li min biketa ezê bimirama. Û ku ez bi- mirama, ew pêncsed mêrê piştî te jî hebana minê tu bikuştal!

Em cihê reşemiyê biguherin!

Salekê di heyva reşemiyê de baran dibare. Wê salê jî baran pir bariye. Îndarî ji barîna baranê nerehet dibin. Aqilmendê wan dibêje:

- Werin em cihê reşemiyê biguherin. Yek dibêje:

- Çawa?
Aqilmend dibêje:
- Emê deh rojên pêşî bikin bihar. Deh rojên navîn bikin havîn. Û deh rojên paşîn jî bikin payiz.

Gundiyekek dibêje:
- Baş e. Lê ku deh rojên navîn de baran bibare. Emê debara xwe çawa hilînin. Ê tev di ber bi baranê bikeve, here.

G .DÊRSILÊ

Mirina Bazirgan

Li ser mirina bazirganekî ku bi fen û dekan nav dabû, lawê wî dicivin. Yek ji wan dibêje: "Gelî bira, wekî ku hûn jî zanin gunehên bavê me pir bûn. Ez rewsa wî ya îşev a di tîrbê de pir meraq dikim. Ez dibêm, ka em du tirban bikolin. Yek ji xwe wê ya bavê me be. A din jî em ê bi diravan mirovekî têxin tîrbeke din. Nav her du tirban jî emê qul bikin, gava ku Munkur û Nekîr (melaîketên qebrê) hatin ser bavê me, ew mirov bila guhdarî bike û were ji me re bibêje."

Ev raman jî aliyê birayên wî yên din ve jî tê pejirandin û bi cih tînin. Êvarî Munker û Nekîr tînin li defter û pirtûkên xwe dinihêrin ku di tirban de ji dêvla yekî ve du mirî hene. Dibên: "Hey em hatine ka em her duyan jî bidarizînin." Berê tînin ser serê gundiye sax. Dibên "De bêje çi gunehên te hebûn?" Gundiyê me ji tîrsa dike bi rastî bimire. Dibêje: "Welleh min pênc bangnotê yekî xwaribû." Li ser vê bersivê dibê tep û repa wan lê didin. Gundî radibe ji tîrbê derdikeve û bi rev tê malê. Lawê bazirgan tev li benda wî ne, da ku xeberekê ji bavê wan bîne. Dibêjin: "De bêje te çi dît, çi nedît?" Gundî dibêje: "Welleh ji bo pênc bangnota dikira ez bikuştama. Hemû hûn wer zanibin ku wê di dê û jina bavê....."

M. BEDRAN BÊNAV

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (109)

XAÇEPIRSA

Ş	K	Ş	E	E					
N	R	E	D	I	N	Z	A	Z	A
N	I	Ş	A	N	E	Q	M		
C	S	E	D	H	E	R	A	N	
H	T	T	R	K	E	Y	O		
T	E	N	I	A	K	B	I	N	
N	Ü	A	D	E	N				
P	E	N	A	B	E	R	I		
K	E	L	A	T	N				
Ş	T	R	A	Z	I	E			

PEYVA VEŞARÎ → NARINÇOK

Bersiva Xaçepirsa 107'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 109'an pirtûka Ali Yılmaz 'Toprak Vatan Kokuyordu' ye.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepir- sê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.




Gomûtan	Kip	Tipek dengdar	Yekineyekî leşkerî	Zikmaki	Zarokên jar û lawaz
Çiyayekî KurdistanêBrecht	Pêrkitek	Tipek	Piştî	
			Tevger		
			Nebatîyek		
Herikbar			Gilor		
Lem			Kaşbûn		
			Roj (berepaşki) Dawera zivê	Nof	
				Sewalên mirî	
Dengdarên 'not'		Bandor			Rê
		Dendarên 'ref'			Tipek dengdar
Tipek					
	Amûrek muzîkê		Alfabeyek		
	Weje		Wekî, mina		
Kurtenivîs a telefonê					
			Wane, ders Tipeke kurdi		
		Cemed			
		Dawera hesinê			
Tipek dengdar		Dawera florê	Dixîn stuyê ga		
Avjenî		Tipek	Tipek		

PEYVA VEŞARÎ →



Dewlet li pey nêçîra HADEP'yan e



42722
98

HADEP rê wayîr vejiyime

HADEP weçînayînê 1995'î de mîlyon û di sey hezar ray (deng) girofîbî. O wext, zehfê şarê ma amebi koçbarkerdin û wayîrê ray eştinê nêbi. La belê, ger nika weçînayînêk biviraziyo HADEP, entay % 10 zêdeyî rê reyan gêrana.

Serokwezîrê komara tirk vatibi: "1998, sera mafê merdîman û demokratîkbiyîn a." Di miyanê enê di aşmanê verînan, ê emserî de weş ame vînayin ke "sera mafê merdîman û demokratîkbiyîn" yena çî wateyî!

Şero qilêrin û neheqo ke Kurdistan de ramiyeno emser jî, gurîti xo ra çîk kemî nêkerd. Îhlalkerdinê mafê merdîman, binçim de vinîkerdin, îşkence, înfazê bêdareznayin berdewam ê. Xora, pêwîst o ke merdim vatenê rayedarane dewleta tirk her tim berevajî fam bikero ke, ê vacê; "siya" merdim lîzim o ke "sipî" fam bikero.

Dewleta, wazena bi hovîti qirê kurdan biyaro û namê kurdîti werte ra hewano. Di dîrokê dinya de, tu dewletê ka enaserîn hov, wehşî û bêtore nêamiya vînayin.

Şarê kurd, di bin serokatîyêka newe û hemdem de çarês (des û çahar) serî ya ke xoverdayînêka (berxwedan) dijwar e, di hemberê ena dewleta zilmar de nişan dana. Di miyanê enê seranê peyinan de şarê ma, zerêka sotî ra têkoşînêka bêhempa da û bî wayîrê gelêk sazgehanê neteweyî. Şarê ma di warê leşkerî, siyasî, çandî, çapemenî û di gelêk waranê bînan de saziyên xo nayê ro (awan kerdê). Enê sazgehan ra jî yew, Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) ya. HADEP'a, îradeyê şarê kurd, ê siyasî temsîl kena û di rayê azadî de mewziyêka bêhempa wa.

Emser jî, sermiyan û serdarane Tirkiya, vatê, "Marjînkerdinî" fekê xo de kerdê vînce (qanîk). Goreyê vatê marjînkerdinî; qaşo! Hêzê çekdarîyê kurdan çokşikiti(!) ameya kerdin û ena hewe, dor amiya waranê bînan. Goreyê konseptê marjînkerdinî; sazgehên çandî, Komelê Mafê Merdîmanê ke Kurdistan de bî, jû bi jû racenyay (girotiyay). Rojnamey amey qedexekerdin. Înan dima êriş berd mabendê giştîyê HADEP ser û sermiyanê partî bi awêko bêhiqûq girofî

binçim û tewqîf kerdî.

Gelo, dewlete bi enê êrişanê xo wazena se bikero?


Di peynî ena ser de yan jî aşmanê verînanê sera 1999'î de weçînayîno (hîlbijartin) biviraziyo. HADEP weçînayînê 1995'î de mîlyon û di sey hezar ray (deng) girofîbî. O wext, zehfê şarê ma amebi koçbarkerdin û wayîrê ray eştinê nêbi. La belê, ger nika weçînayînêk biviraziyo HADEP, entay % 10 zêdeyî rê reyan gêrana. Dewlete, bi enê êrişanê xo wazena vernî roversiyayînê HADEP bigêro û îradeyê siyasî ya şarê ma bifetesîno.

Ke merdim banêro wext û zemanê enê êrişanê sistamîkan ra, go tay çî bi awêka zelal verçim bibê. Di enê aşmanê peynînan de Amerîka ya împeryalistê, seba ke Rohelatê Miyanî bigêro bin lepê xo û hêviya şaranê mazlûman bifetesno û awê kendavî kerda lîşin. Pêro yê şaranê dinya û dorûveranê demokratîkan balê xo şawo ena hovîti Amerîka. Dewleta tirke jî, ena teflûdûman de keys û firsendî xo da nişan û bi dizdî êrişanê xo raminena. Yanê, hetêk ra zarence amî guna çîwa aye ra.

Şarê kurdo ke metropolan de biyo vila, serhewanayin û xoverdayînê xo her tim berdewam kenê. Dewlete jî, wazena sermiyananê HADEP'î zere de zey rehînan tepişte bigêro û bi eno hewa hem şêlik çimtersî bikero û hem jî, verniyê serhewaniyanê metropolan bigêro.

Sera 1997 de tînzîdbûnê şarê kurdî û kedkaranê Anatolî zêdera viraziya. Heta, PKK vatibi: "Ma henî biyê partiya Tirkiya. Ma temsîlkarê şarê kurdî û şarê Anatolî piya yê." Dewlete bi enê êrişanê xo yê-HADEP'î ser wazena; ena tînzîdbûna şaran pûç vecû û dijminatî ya miyanê şaran de bizêdino.

Weçînayînê ke muhtemel de, çepanê tirkan û dorûverê demokratîkandir îtîfaq meheqq go biviraziyo. Dewlete bi enê êrişanê xo



Murat Bozlak

wazena HADEP'î rûmet ra bifino û bazarê îtîfaqanê muhtemelan de HADEP qels bifino. Komplo û fen û fûtê dewlete enê yê û zey tîja rojî eşekera yê. Şarê ma seba ke jiyanêka bi rûmete û azadiya xo bi dest fino, gelêk berdêlî day. Azadî amiya verê feki. Poste terênawo ardo dime. Lazim o ke, postê xo di dimê de nêverdo û kewçike verê fekê xo ra tepa nêbero.

Roj roja yewbiyayin û rêxistinbiyan o. Roj roja vengê xo berzkerdîni ya. Pêwîst o, her game zêdeyêrî ma HADEP rê wayîr veciyî. HADEP û sazgehanê netewiyan wayirveciyayin, azadî, rûmet û şerefê xo ra wayirveciyayina. Wayîr-veciyayina înan miheqq go xo dir jiyana bi rûmet e, biratiya şaran, aşî, azadî ma ra biyaro.

Wa dewlete baş bizano ke, bi tewqîf-kerdîne çend sermiyanan, HADEP nêqedêyena û ewro panc hezarî sermiyan û rayedarê HADEP estê. Panciyes mîlyon kurd HADEP bi xo ya.

ROJŞAN LEZGÎN

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Gündem Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
SELAHATTİN DELİ

Yönetim Yeri:
Çakırağa Mah. Sorguççu
Sk. No: 11/6
Aksaray / İSTANBUL

Bûroya İrtibatê (İrtibat
Bürosu)
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
NÜNERİTİYEN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsv
Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 17 40

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 04 85 55 43

ÜLKEDE

Ji Gündemê

Ji editora Ü. Gündemê

Dema em bixwazin, paşeroja Tirkîyeyê tevî rojên ku em tê de ne, binîn ber çavên xwe, rastiyek xwe dide der. Ev rastî ev e ku ji wan rojan ta îro siyaseta ne bi destê sivilan, lê bi destê leşkeran hatiye meşandin. MGK'ya ku wekî bîrnamayên hikûmetê belgeyên siyasî dide weşandin, tevî ku îradeya meclîsê bînpê dike, bi awayekî tund polîtîkaya xwe jî li ser îradeya gel dike ferz. Partiyên ku alîgirên bîrdoza fermî ne li aliyekî, Tirkîyeya ku ev salek e bi koalîsyonan bi rê ve diçe, her çiqas qala demokratîkbûnê, dibe hew çend jî gel bi êrîşên antî-demokratîk ve rû bi rû ma. Li ser navê demokratîkbûnê girtina partiyên, berdewamkirina înfazên bêdarizandin û rêlibergirtina azadiya derbirinê, gelek baş dide eşkerekirin ku tu tişt li Tirkîyeyê neguhêriye.

Kevneşopa mîmarê cuntaya 12'ê rezberê îro di çarçoweya zagonan de car caran bi

DI SIYASETÊ DE RESTORASYON

tanq û topan, carinan bi 'siwarkirina hevkeşeyê (balansa ayan) yan û carina jî bi biryarên wekî 28 reşemiyê derdikeve pêşberî gel. Di vê rewşê de hikûmetê jixwe îflas kiriye. Bîrdoza fermî di nav qeyraneke tund de ye. Şîrikên hikûmeta ku di bin bandora MGK'ê de ye, piştî girtina Partiya Refahê ketin qirika hev. Zagona cil û bergan ku ji 12'yê rezberê maye, hikûmetê dixwe nav tengasiyê, yek ji wan bes hilbijartinê, yê din her du yan jî rexne dike. Partiya Refahê, her çiqas hatiye girtin jî, dîsa partiya herî mezin e û di muhalefê de ye. Medyaya birjuwa ku çav û guhên xwe ji qeyranên hikûmetê re girtiye, demekê dûvedirêj bi bûyera revandina balafirê re eleqedar bû. Hînan jî wan rûpela xwe ya pêşîn hemû, yê din jî di nav rojnameyê de 2 rûpel jî ve bûyerê re weqetandin. Lê heman çapemeniyê cîr neda xwendekarên ku, ji bo wan 96 sal ceza tê xwestin û ku yek ji wan jî bi îdamê tê darizandin. Dîsa çavên xwe ji bo grevên birçibûnê li Giresûn û Midyadê re girtin. Her wiha tiştên ku li Kurdistanê diqewimin, ku ji gurehiya xwe tu tişt winda nakin jî hiş û aqilên xwe dûr xistin. Partiyên siyasî di nav sergêjiyê de ne. Rewşa medyayê diyar e. Gelo ji van yekan kî sûdê werdigire? Gelo fêda kedkar, karker, xwendekar, rewşenbîran di vê rewşê de heyê? Bêguman tune ye. Em dê dîsa van rastîyan bibêjin û binivîsin.

Salvegera biryarên 28'ê reşemiyê. Dîsa civîneke MGK'ê. Dîsa jî bo ku hevkeşeya derdorên şoreşger, eniya kedkaran û demokratîkxwazan bîr sazkin guftûgo û nîqaşên kirin.

22 reşemî 1998 yekşem:

ÖCALAN: "ÇARESERÎ BI YEKÎTIYÊ GENGAZ E"

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, rûdanên dawîn, ku piştî qeyrana kendavê berpê bûne, nîrxand. Öcalan got ku, Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) dixwaze, li Rojhilata Naverast statûkoya 1958'an durist bike. Lewre jî, ji bo pêkhatina vê statûkoyê çekên kîmyewî û biyolojîk ên ku di destê Îraqê de ne, dike hincet. Abdullah Öcalan, bi bîrxist ku desthilatdariya Amerîkayê ya li ser Îraqê hevkat serdestiya li ser tevahiya serzemîna Asyayê bi xwe ye jî. Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan, qeyrana kendavê ji bo kurdan wekî fersendeke dîrokî bi nav kir û got ku di pêvajoya îroyîn de, ji bo kurdan avakirina dewletê, ne zor girîng e. Öcalan di vî warî de wiha got: "Di pêvajoya îro de li ser xaka Rojhilata Naverast, netewebûn û inîsiyatîfa gelan gengaz û pêwîst e, ji bo wan pêldayîneke şoreşgerî girîng e. Bi boçûna min, em bêhtir nêzikî serkeftinê ne"

Öcalan, sebarek bi penaberên Qempa Nînovayê jî wiha got: "PDK nêzîktêdayîneke tewş û xirab li ser lîqewmînen (maxdûrên) şer dirust dike û ramyariya xwe li pey berjewendiyên Tirkîyeyê bi rêve dibe" Di heman katê de Öcalan da zanîn ku, di nav PDK'yê de jî, kes û derdorên ku dixwazin yekîtiyekî neteweyî pêk were, hene. Li hêla din Öcalan, ji bo rêgaçareya arîşeyên kurdan pêwîstiya yekîtiya hêzên kurdistanî dubare kir.

23 reşemî 1998 duşem:

GEL LANET LI ÎNFAZÊ BARAND

Ji bo Gulistan Özdemir, ku li Fatîha Stenbolê tevî Hamdi Salgın, jî hêla polîsan ve hatibû înfazkirin, 3 hezar kes ji bo ku wê yad bikin, civîyan. Di civîna ku li "Goristana Kanarya" yê pêk hat de, girseya gel sloganên wekî "Şehîd Namirin" avêt, kulîlkên sor danîn ser gorê û Qurani Kerîm xwendin. Di axaftinê ku li merasîmê hatine kirin de, hate gotin ku li dijî gelê kurd polîtîkayên qirkirinê tene meşandin. Ji bo Gulistan Özdemir di axaftinê de wisa hate gotin: "Ew ji welatê xwe bi darê zorê hatibû koçberkirin, dewletê li Sten-

bolê jî dev jê berneda. Lewre jî hîn di 15 sâliya xwe de bi guleyekî qelaş hate kuştin" Her wiha di merasîmê de, li ser pest û kotekiyên li ser HADEP'ê hate axivîn û helwesta dewletê hate şerm-zarkirin. Li ser gora Gulistan Özdemir, Serokê HADEP'a Fatîhê Mele Mecit Kapazan Qurani Kerîm xwend û dia kir.

24 reşemî 1998 Sêşem:

ÊRÎŞÊN LI SER HADEP'Ê DIDOMIN

Êrîşên li ser HADEP'ê, ku bi hinceta salnameya 1998'an dest pê kiribûn, didomin. Piştî dagirkirina Navenda Giştî û girtina Serokê Giştî Murat Bozlak û 6 rayedarên wê, niha jî Sekreterê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) Nazmi Gür, bi hinceta ku li Navenda HADEP'ê perwerdehiya mafên mirovan daye, hate binçavkirin. Di heman katê de, hate ragihandin ku Sekreterê Mafên Mirovan ê Sendîkeya KESK'ê Tayfun İşçi jî, ji bo ku der barê sendîkevaniyê de li HADEP'ê semîner daye, hatiye binçavkirin. Nazmi Gür di maweya binçavkirinê de xwestiya ku li parêzerên xwe bigere, lê polîsan hereşe lê kirine û jê re wisa gotine: "Me kesekî wekî Hanîfî Avcî xistiye binçav, qey tu kî yî lawo?"

Serokê Giştî yê İHD'yê Akın Birdal, piştî van palemaran çû cem dozgeriya DGM'ê û got ku binçavkirina Nazmi Gür jî layê wan ve nayê pejirandin, ev rûdan nehiqûqî ye û divê Nazmi Gür di zûtirîn katê de serbest bê berdan. Li hêla din li Bursayê Serokê HADEP'a Yıldırımê jî di fiav de 7 endamên HADEP'ê hatin binçavkirin.

25 reşemî 1998 çarşem:

DI BOMBOKIRINAN DE DESTÊ MÎT'Ê HEYE

Tirkîye jî bo ku li Suriyeyê alozî û tevliheviyê pêk bîne ligel rêxisti-



Rêlibergirtin û zordariyên le ser Ülkede Gündemê didomin

na "Birayên Misilman (EXWAN)" tîkilî û didarên nepênî saz kirine. Eşkerekî bû ku, bombekirinên li Suriyeyê, ku di sala 1996'an de pêk hatibûn di bin inîsiyatîfa Tirkîyeyê de çêbûne.

Wekî tê zanîn di gulan û pûşpera 1996'an de li bajarên Şam, Heleb, Hama, Hûmis, Lazkiye û li Qamişloya ku piraniya niştecîhên wê kurd in, bombekirin pêk hatibûn û di encamê van bombekirinan de gelek kesên sivil miribûn. Niha diyar dibe ku ev bombekirin bi destê ajanên MÎT'ê pêk hatine. Suriyeya ku wê gavê tu zanyariyên fermî nedabûn, gelek kesên tirkmen xistibûn binçav û bi 'notaya zer' dewleta tirk îkaz kiribû.

Hevkat endamên MÎT'ê jî bo ku derbeyeke xedar li aboriya Suriyeyê bixin, pereyên sexte yê Suriyeyê û dolarên sexte (qelp) li piyaseya Tirkîyeyê û Suriyeyê belav kirine.

26 reşemî 1998 pêncşem:

LI GIRTÎGEHA GİRESUNÊ LI HEV HATIN

Greva birçibûnê (mangirtin) ya li Girtîgeha Giresûnê, ku ji bo şertên jiyaneke mirovane bi dorvegerî dest pê kiribû û ji 7'ê rêbendanê ve bê dorvegerî dom dikir, piştî hewldanên heyeta ku ji Enqereyê çûbû, di roja xwe ya 49'an de bi lihevhatinê qediya. Bi vê lihevhatinê bi piranî şert û daxwazên girtiyên PKK'yî hatin pejirandin. Piştî lihevhatinê girtiyên koma yekem, ku ji 7'ê rêbendanê ve di grevê de ne û ku qet nikanin av û nebatên avî vexwin; jî hêla bijîşk (doktor) ên ku bi heyetê re hatibûn, mudaxelaya yekemîn li wan hate kirin.